

Av. Osman Baydemir:

Armanca me ev e ku mafêñ bingehîn ên kurdan bêñ pejirandin. Aşfî jî bingeha vê yekê ye.

Berî her tişfî em hêvî dikin ku hikûmet nekeve nav van hesasiyetên bêwate û bihêle ku em bikevin nava Amedê.

Heke nehêle ku em bikevin nava Amedê, em ê jî tiştên pêwîst bikin. Em ê hem dayikêñ leşkeran hem jî dayikêñ gerîlayan tevî vê çalakiyê bikin. Dewlet vî şerî li ser navê gelê tirk didomîne. Em ê rewşenbîr û siyasetmedarêñ tirk tevî vê organîzasyonê bikin da ku bibêjin: "Ev şer ne li ser navê me tê meşandin."

R.3



## IHD'ye berî l'ê Rezberê lez da çalakiyên astiyê **Îsal jî otobûsa astiyê bi rê dikeve**

Hevpevîn: Salihê Şernexî- Dengbêjî evîneke mezin e - Rûpel 8-9

Nûçe: "Rûdanêñ dawîn ji ber tirsê ye" - Rûpel 16

Şehîd: Pênc pilingêñ Geliyê Rizê - Rûpel 16


Aborî-Civakî: Li Kurdistanê projeyê dagirkeran 'GAP' - Rûpel 4

Mahmut Kılınç: Ew nîjadperestî ye rpl.5

Osman Özçelik: Diyarbakırın 'D'si rpl.13

Lerzan Jandîl: Gamêde newiye rpl.11

Serkan Brûsk: Festîvala Ciwanan rpl.7



SAMİ TAN

Ev piştevanî nîşan dide ku çeteyên fermî û sivîl nikarin bi êrîşen wiha tiştekî bi dest bixin. Jixwe, hevalê ku leqayî vê êrîşê hatibû bênavber û bi moreleke bilind rojname belav kir.

**C**eteven dewletê piştî ku bûyera Susurlukê hinekî hate jibîkirin, veko yeko têne berdan, ji bo ku ew bi temamî ji súcdariyê bêne şüştin amadekariya efüyeke giştî tê kirin. Bi vê yekê re ji serokên çeteyan an têne girtin, an ji xwe disperin hêzên dewletê. Piştî Alaatin Çakıcı, Sedat Peker ji hate girtin. Ev giş didin ser şopa Oral Çelik, lewre dizinan ku dê werin berdan.

Li aliyekevî ev tiş dibin, li aliye din ji nahêlin ku karkerêne kurd bikevin nava hinek bajaran, qala vîzeyê tê kirin. Hêzên dewletê van deman li metropolan hinek livbaziyên provokatif pêk tînin û dixin stûyê tevgera kurd, bi vê yekê ji dixwazin hesten şovenist berzir bikin. Piştî cil rojî bûyera "Mısır Çarşısı" wekî çalakiyeke PKK'ê bi nav kirin û du kes wekî berpirsê vê bûyerê nîşan dan. Çapemeniya tirk ku li ser bersûcên bûyerê senaryoyê ku kenê mirov tînin, diafirîne, qet cih neda daxuyaniya ERNK'ê ya li ser bûyerê. Ev ji

nîşan dide ku ev çalakî parçeyekî şerê psîkolojik in.

Her wekî berê ji hate daxuyandin, bi geşbûna xebaten rojnameya me re êrişen hêzên dagirker ji lez girtin. Ji Amedê heta Stenbolê gelek xebatkarên rojnameyê hatin girtin, piştî tahde û getan hatin berdan. Bûyera dawîn ji li ser Nûnergeha me ya Mêrsînê pêk hat. Roja 19'ê mehê du kesen faşist wekî mîvan hatine nûnergehê, piştî êrişî xebatkarê rojnameyê Ekrem Hazar kirine, digel iedaneke hovane, gef ji lê xwarine û piştî ji nûnergehê vejetiyane. Vê êrişîa hovane reaksiyonâ hemû derdorê demokratik kişand. Gelek kes û saziyên demokratik û xwendevanên rojnameyê ci bi telefonê ci ji bi serdanen xwe piştevaniya xwe ji bo rojnameyê diyar kirin. Bo nimûne berpirsên kovara Avaşîn û İnstîtuya Kurdî ya Stockholmê peyameke piştigiriyê ji me re bi rî kiriye û dane zanîn ku ew êşa xebatkarê Azadiya Welat wekkî êşa xwe dizinan. Her wiha roja 20'ê

mehê ji bi beşdariya sed xwendevanên rojnameyê û nûnergeha gelek saziyên wekî HADEP, EMEP, ÖDP, Liman-İş, Sey-der, Eğitim-Sen, ÇHD, NÇM, Ayrılm, Özgür Halk, Ülkede Gündem û Radyo Metropolê li ber nûnergeha Mêrsînê daxuyanîya çapemeniyê hate xwendin. Çalakî bi sloganen mîna "Dê çete hesab bidin gel!", "Pest û pêkutî nikarin li ber xebata me bibin asteng!", "Dengê çapemeniya Azad nayê birîn!" qedîya.

Ev piştevanî nîşan dide ku çeteyen fermî û sivîl nikarin bi êrîşen wiha tiştekî bi dest bixin. Lî bi van kirinan zikreşî û rûreşîya xwe nîşan didin. Jixwe, hevalê ku leqayî vê êrişîa hovane hatibû bênavber karê xwe domand û piştî bûyerê bi vîn û moreleke bilind dîsa rojname belav kir. Hemû xebatkarê rojnameyê ji heman helwestê nîşan didin. Divê her kes bizane ku ci li navendê ci ji li nûnergehan dê xebatê geşkirina doza Azadiya Welat bidome.

# Daxwaza kurd konferansa kurd e

## Ferhengok

**abonîzan:** ekonomist  
**afrîandi:** pêkanîn (yaratmak)

**aso:** úfq  
**belavok:** bildiri

**bendav:** baraj  
**berg:** qapê pirtûkê

**bertek:** reaksiyon  
**bînpêkirin:** pêpeskirin

**bînyat:** kok û esil  
**buha:** bedel (fiat)

**çesipandin:** tes-dîqkirin

**dane:** avakar (kuru-cu)

**darejin:** nîvisin  
**defîder:** motîvekar

**erjeng:** tırsnak (korkunç)

**hêzên bejîyî:** kara kuvetleri

**hovane:** wehşiyane  
**kelepor:** mîrate, mîras

**kurtekur:** tırsıkçı

**laçwerde:** maden  
**lawaz:** qels û

**zirav:**  
**malen berxwaryê:** tüketim malları

**metîni:** endişe

**nîrx:** hêjâhî (değer)

**pawan:** tekel

**palikê çavan:** göz kapağı

**perwerdehî:** hêvojkarî (egitim)

**pêşber:** hember

**pêşek:** pêşgotin

**pêşeroj:** diwaroj

**pêşnûma:** proje

**pîştevanî:** piştigirî

**pîşesazî:** sanayii

**qeran:** krîz

**rêc:** şop

**rêveberî:** kargerî (yönetim)

**rêzenav:** dizin

**rîst:** rol

**serbaz:** leşker

**sanazi:** kêfxweşî

**şenî:** ahalî

**tirad:** maç

**werzîş:** spor

**zanîst:** zanyarî (bilim)

**zanko:** zanîngeh (üniversite)

**zimîn:** olandan (yansıma)

**zîkreşî:** dexesî

**zîhev:** üveye baba

VEDAT AYDIN/ ÜMRANIYE

**P**irsgirêka kurdî êdî sînorêne welat derbas kirine. Bûye meseleya navnîteyî. Her kes li ser kurdan û çareserkirina gelşeya wan diaxive, planan tîne zimîn û li gorî berjewandiyen xwe xebatan dimeşînin. "Konferansa Kurd" ji di van demen dawî de li ser zimanê her kesî ye û ketiye rojeva cihânî. Lî mixabin hin kurdîn me, hê li ser pêwîstbûna konferanseke wisa guftûgoyen akademik dimeşînin û ji wan tirê xebateke pir mezin dikan. Ev yek kemasî û gunehê wan e. Gunehê wan di stûyê wan de be. Lî gelê me ji di keve agirê wan.

Bêşik piştî ewqas şehîd şer û bedel konferanseke neteweyî hêvî û daxwaziya gelê me ye. Gelê me bi rîberiya tevgera azadiyê, di bin parastina artêşa gel de yekîtiya neteweyî dixwaze. Ev ji bêyî avakirina saziyên neteweyî nabe. Ji ber vê yekê ji, "Konferansa Kurd" dê gava yekemîn be.

Amerika, dewletên Ewrûpayê Ereb û rûs li ser pirsgirêka kurdan radiwestin. Hin ji wan konferansan li dar dixin, hin ji wan pêşniyaren xwe tînin zimîn. Di eniya

komara tirk de ji ev xebat hene. Ji aliyekevî de "Zanyar" û "Pispor" ên mîna D. Ergil li derive lotikan davêjin û ji bo armanca xwe hewl didin ku civînan li dar bixin, ji aliye din ve ji neteweperesten şoven ên mîna Murat Karayalçın pêşniyara konferansa kurd dikan. Helbet tev ji bo berjewendiyen xwe dikan. Ne evîndarê gel û welatê me ne.

**Gelê me bi rîberiya tevgera azadiyê, di bin parastina artêşa gel de yekîtiya neteweyî dixwaze. Ev ji bêyî avakirina saziyên neteweyî nabe. Ji ber vê yekê ji, "Konferansa Kurd" dê gava yekemîn be.**

Gelo em kurd çîma ne di nava xebateke wisa de bin? Ji bo ci em kula xwe, bi destê xwe derman nekin? Heya kengî wê çavên me li derive bin û emê çarenûsa xwe bi komara tirkan û İsrail an ji bi Ameriqayê ve girê bidin? Ji bo ci?

Bersiva van pirsan di radeya welatparêzî û şoresgeriyê de vêşartîye. Mirov, tevger, yan ji partiyeke ku berjewendiyen xwe di ser berjewendiyen neteweyî re bigire helbet wê ji platformeke neteweyî bireve. Yen ku dilê wan bi agirê yekîti û azadiyê neşewite û rizga-

riya welat di kûrahiya dilê xwe de nehesînin, nikarin tevlî xebatêkî wisa bibin. Lewre ew agir wê wan bişewitîne. Yen bi xwe û hêza gelê xwe ne bawer bin û çavên wan li hêzine "mezin" bin, helbet dest navêjin karekî wisa. Lewre wan, ji mezinên xwe wer bihîstine, wer dîtine. Ew reben bûne, lî dixwazin li ser navê gel ji rebenî û lengaziya xwe bimeşînin.

Dibe ku ew bi xwe ne bawer bin, lî gelê me bi xwe bawer e û yekîtiyê dixwaze. Bi hezaran şehîdên gelê me hene. Ew ne bi tenê yên tevgera azadiyê ne, ew şehîdên rizgariyê û azadiya gel û welatê me ne. Bi deh hezaran şervanên azadiyê li çar aliyê welêt di şer de ne û bi lehengiyeke bêhem-pa li ber xwe didin. Ew ji nîrx, şe ref û namûsa vî welatî ne.

Belê, bi tenê şehîd û şervanên gelê me ji bo sedema yekîti, bi xwe bawerbûn û têkoşînê bes in Xebat, civîn, konferans an ji kongreyeke ku li ser vî esasî bimeş helbet wê bi ser bikeve. Lî yên ku vê yekê ji xwe re nekin jîngeh, destpêk wê pişta xwe bidin doza welatê xwe. Milê wan wê têkeve milê împeryalist, dagirker û xayînan, wê riya wan riya Şerafettin û Hemreş Reşo be.

# iHD'ye berî 1'ê Rezberê lez da çalakiyên aştiyê Îsal jî otobûsa aştiyê bi rê dikeve

Roja 20'ê meha gelawêj li Hotel Sed ji aliyê İHD'ye ve civîneke çapemeniyê der barê vê projeya aştiyê de hate lidarxistin. Pêşî Parêzer Eren Keskin axivî û daxuyand ku ji bo aştiyê, ji bo vê daxwazê ji dil û can ew ê xwe bigihînin her kesî û ew wisa bawer dikin ku wê gelek kes besdarî vê çalakiyê bibin.

Ji bo Roja Aştiyê ya Cîhanê 1'ê Rêzberê İHD'ye bi dest organîzasione yonkê berfireh kir. Li gorî projeya aştiyê ya İHD'ye bi giştî wê hunermend, nivîskar, rojnameger û kesen navdar ên tirk tevlî vê organizasyonê bibin. Organîzasyonek di sala 1997'an de di yekê rêzberê de li ser navê Apê Musa ji aliyê komeleyên navneteweyî ve hatibû çêkirin û ji Stenbolê ber bi Amedê ve rêuwiyyê dest pê kiribû. Lé ji aliyê dewleta tirk ve bo ketina Amedê destûr nehatibû dayîn. Projeya îsal jî heman organizasyon e, lê belê bi giştî wê tirk besdarî vê rêuwiyyê bibin. Wê du otobûs 31'ê gelawêjî ji ber TUYAP'ê bi rê bikevin. Ji vêga de ji raya giştî û ji gel piştgiriyê dixwazin û bi dirûşmeya "Heke niha aşti nebe dê kengî bibe" bangê li hemû kesen aşfîwaz dikin.

Roja 20'ê meha gelawêj li Hotel Sed ji aliyê İHD'ye ve civîneke çapemeniyê der barê vê projeya aştiyê de hate lidarxistin. Pêşî Parêzer Eren Keskin axivî û daxuyand ku ji bo aştiyê, ji bo vê daxwazê ji dil û can ew ê xwe bigihînin her kesî û ew wisa bawer dikin ku wê gelek kes besdarî vê çalakiyê bibin. Di berdewama ahaftina xwe de Keskin wiha got: "Me bi giştî giranî da ser partiyênu ku heta niha nebûne şîrîkî iktîdarê. Me ji malbatênu şehîdan bigirin heta rêtixtinêni girseyî bi gelek kesan re têkilî danîn. Em bawer in ku wê heta yekê rêzberê gelek kes û sazî piştgiriya me bikin."

Piştî ahaftina Keskin Cigirê Serokê Giştî yê İHD'ye Parêzer Osman Baydemir ku endamekî komîteya amadekar e, ahaftinek kir. Baydemir di ahaftina xwe de bi giştî li ser mafênu kurdan ên bingehîn rawestiya û daxuyand ku pêwîst e mafê hîquqî bêne pejîrandin. Her wiha Baydemir di berdewama ahaftina xwe de ev tişt gotin: "Li vî welati pêwîst e her kes di warê aborî, sîyasî, cîvakî û çandî de wekî hevbe. Di demeke kurt de divê azadî û mafênu bingehîn yêne kurdan bêne pejîrandin. Ev projeya me jî ji bo vê yekê ye." Piştî ahaftina xwe, Baydemir daxuyaniya çapemeniyê xwend. Di daxuyaniyê de ev tişt hebûn: "Em aştiyê dixwazin. Em hê jî hêvîdar in û em bi wan hêviyan diçin Amedê."

Em aştiyê dixwazin ji ber ku;

Ev bi salan e 40 hezar insanî li ser cografyaya me jiyanâ xwe ji dest daye. Bi hezaran kes jî birîndar û sejet mane. Êdi em naxwazin ku tu kes bimire û se-

qet bîmîne.

Em aştiyê dixwazin ji ber ku;

Em dixwazin ku hew Tirkîye bi xwîn û hêstirêن çavan bê şüştin. Em aştiyê dixwazin û careke din dengê xwe li hemberî yênu ku ji şer rantê bi dest dixin bilind dikin û ji kirinê wan re dibejin "Na!", em bi vê hêviyê diçin Amedê."

## Nivîskar, sîsetmedar û hunermend der barê aştiyê de ci difikirin?

Ercan Kanar: Ev bi salan e ku de rbarê aştiyê de xebat tên kirin. Lé belê heta niha me ji çalakiyên aştiyê tiştek bi dest nexist. Em ê niha çalakiyeke din bidin destpêkirin. Lé belê xeletiyek heye. Em her dem li bendeyî aştiyê ne. Heke em hemû sazî, rewşenbîr sendîkavan, nikarîbin tiraliya li bende-mayînê veguhezin hêza aştîwazîyê û vê yekê ji xwe nekin awayekî jiyanê, em ê gelek tiştan bidin der. Di pêşerojê de êdî wê bazirganêni şer, wê axaftinêni dûvedirêj li ser aştiyê bikin. Li aliyekî wê walîyê cudaxwaz yêna rastîn wekî Ordu û Giresunê ji bo ku gelan berdin



Li Sed Otelê ji bo çalakiya Otobûsa Aştiyê daxuyaniya çapemeniyê ji aliyê İHD'ye ve hate dayîn.

gî bibe" bidin, divê rewşenbîrê tirk û yên kurd xwe bêhtir bixin nav têkoşînê.

Weşanger Erdal Öz: Li Tirkîyeyê raya giştî ya bêbandor û gelekî bêreaksiyon heye. Hûn nikarin dayîna mafê derbirîna ramanan bispêrin gel. Ji ber ku derbirîna ramana bo kesen ku difiki-

betî li welatê me ev 15 sal in ku şerek didome. Bi taybetî aşti li Tirkîyeyê bûye tiştekî ku mirov nikare xwe jê bide alî. Em dibînin ku aşti salê çarekê bi bîra me dikeve. Ji duh heta iro vê nêziktedayînê tiştek bidest nexistiye. Ji bo em aştiyekî mayînde li Tirkîyeyê pêk bînîn divê tu carî aşti ji rojeva me dernekeve. Divê İHD vê xebata xwe hê berfirehtir û demdirêjtir bike. Em dê heta dawî piştgiriyyê bikin.

Seyit Aslan (EMEP): Divê em xebata aştiyê ji niyetê wêdetir veguhizîn teknosinekê. Em dê di vî warî de ji her aliyî ve piştgiriya İHD'ye bikin.

Bilgesu Erenus: Wê xebatê aştiyê bi yekê rêzberê re bi sînor bîmîn na-be. Ez di wê gumanê de me. Wekî pêşniyaz divê em çalakiyên yekê rêzberê heta 29'ê kewçerê bidomînin. Damez-rîna komarê bi tenê ji aliyê saziyên fermî û pawanê mezîn ve tê pîrozikirin. Lé belê di warê komarê de divê dengê me jî derkeve. Li ser vê axê dilê me jan daye û me li ber xwe de ye. Di nav avakirina komarê de xwîn û keda me jî heye. Ji ber wê yekê ev mafê me heye.

Münir Ceylan: Ez jî wekî hin hevalen xwe di wê baweriyê de me ku heta niha xebatê aştiyê li gorî dilê me encameke baş nadane. Em di nav xemgîniya vê yekê de ne. Ez wekî sendîkavanekî berê xwerexnehiya xwe jî didim. Bi taybetî di nav çalakiyên aştiyê de sendîka zêde cih nagirin. Divê karker ji ji vir û pê de li pêşîya çalakiyên aştiyê cihen xwe bigirin. Bi vê mebestê ez carakedin bangê li hemûkan dikim da ku li xebatê aştiyê xwedî derekevin.

AZAD ALTUN



Dîmenek ji çalakiya şala par a  
Trêna Aştiyê ya Apê Mûsa

hev tişte ku ji destê wan tê bikin. Bi taybetî heke em nikarîbin raya giştî ya tirk hişyar bikin, rojekê em ê gelekî dereng bîmîn. Divê em lezê bidin xebatê aştiyê.

Mehmet Atay (ÖDP): Heta niha em di warê aştiye de ku ev jî berpirsiyariyeke giran e wekî desthilatdaran bi bandor nebûne. Hêzên desthilatdar dixwazin ku dijminatiyekî bixin navbera herdu gelan. Ji bo ku em bikarîbin ber-siva pirsa "aşti heke niha nebe, dê ken-


rin e. Gelekî ku hînî naveroka derbirîna ramana nebûye jê jî fêm nake. Lé belê piştî ku di şer de cil hezar kes hatin kuştin û bi sed hezaran kes ku seqet man û birîndar ketin, divê bandorek li ser girseyê çebûbe. Ez bawerim ku wê girseya bêreaksiyon piştî vî şerî dijwar dinav gelek zor û zahmetiyan de piştgiriya we bike. Ez İHD'ye ji ber vê projeyê pîrozîkim û ezê heta dawî li pey projeyen aştiyê bimeşim.

Mahmut Eşiyok (HADEP): Bi tay-

# Li Kurdistanê projeyên dewletê dagirker

## GAP

Çawa ku pişti çêkirina Bendava Kebanê tevahiya deştêni biadan di bin avê de mane û 33 hezar û 500 kes hatine koçberkîrin, gelek navce û gundêni Amed, Ruha û Semsûrê jî di binê ava gola Bendava Atatürk de mane. Ji ber bendavan 18 hezar û 130 malbatêni ku hejmara şeniyê wan 113 hezar û 496 kes e ji mecbûri herêm terikandine.



**H**erêma na-verast a Kurdistanê bi pêşnû-maya Master a GAP'ê re ku ji aliyê firmaya Nippon a japonan ve hatiye amadekirin bo veberhênan pawanê navneteweyî jî hatiye sazkin. Ji bo vê projeya Gelyê Tennessee ya Amerîkayê wekî nimûne hate girtin. Di bin finansoriya Bankaya Cihanê de firma-yen tirk ên ku hêza kar a erzan bi kar tînin, têne liv û lebatê. Di warê ax û çandiniyê de sazkinen nû pêk hatin.

Bi mebesta avdanê û bi destxistina vejenê li ser çemêni Ferat û Dijleyê avakirina 22 bendav û santralêni hidro-elektrikê didome. Tê gotin ku piştî kutabûna 1.8 milyon hektar erd dê were avdan û di salekê de 23 milyar KW elektrikê dê were bidestxistin. Ligel madeya xav a cawî, xwarin û berên çandiniyê ji bo veguhesina kanen vejenê bo metropolen Tirkîyeyê û bazarên cihanê xebatêni birêkûpêk têne kirin. Bi xebatêni çandin, veguhesin, avahî, pîşesazî, perwerdehî, elektrîfikasyon û ragihandinê Kurdistan bi projeyê ve tête girêdan.

Di serî de firma û pawanê navneteweyî yên Tirkîyeyê, İsrail, Almanya, DYB û gelek welatêni din an zeviyê çandiniyê yan warê kargehan bi serê xwe an jî bi hevbeşî dikirin.

Çawa ku piştî çêkirina Bendava Kebanê tevahiya deştêni biadan di bin avê de mane û 33 hezar û 500 kes hatiye koçberkîrin, gelek navce û gundêni Amed, Ruha û Semsûrê jî di binê ava gola Bendava Atatürk de mane. Ji ber bendavan 18 hezar û 130 malbatêni ku hejmara şeniyê wan 113 hezar û 496 kes e ji mecbûri herêm terikandine.

ne.

### Pîşesazî

Dema ku mirov bi rengeki serebere (eletexmîn) lê hûr dibe, dixuye ku di serî de saziyên pîşesaziyê yên ku ji hêla dewletê ve hatine avakirin li Kurdistanê hene. Hejmara kargehêni êrd, êm, testîl, şekir, hîrî, çerm, şîr û çimentoyê zêdetir e. Her wiha saziyên ku lajwerdan (maden) derdixin ên ku hinekan di cih de bi kar tînin û hinekan jî vediguhezînin metropolan mewcûd in. Bi destê sektora taybet jî dezgehêni biçûk hatine avakirin. Ev dezgeh bêtir wekî dûmahîka saziyên ku bi destê dewletê hatine sazkin in.

Bi arizikirin salâ 1990'î re li ber destê dewletê çend sazî man. Dewletê saziyên mezin ku kara wan zêde ye, wekî kargehêni tekstîl û çimentoyê bi teşwîqan dewrî holdîngan kirin. Bi arizikirin saziyên biçûk de berjewendiyê politikî esas hatine girtin; serok-çahş, neteweperest û siyasetmedarêni kurd ên ku bi dewletê re di hevkîyê de ne, hatine tercîhîkirin. Dewletê kargehêni şîr, ard, êm, kombîneyê goşt û masiyan firotine wan. Dewletê, hin saziyên ku nehatin arizikirin jî dewrî bellediyeyan, artêşî û rêveberiyê taybet ên bajaran kirin. Pîşesaziya sazkarî (kurulu sanayii) xwe dispêre hilberîna malen berxwariyê. Ji vê hêlê ve hewceyî pîşesaziya malen hilberîna û nîvkêrhatî (ara mal) yên Tirkîyeyê ye. Hejmara carandinê ya têkiliyê ya berbişê û berbipaş a berên ku têne hilberandin nizim e.

Ew cure pîşesazî ne li gorî pêşveçû-

nîn pîşesaziya entegre, berfirehbûn û mezinbûnê ye. Hacet û amûrên ku pîşesaziya malen veberhênanê û nîvkêrhatî hildiberîne, bi kar tîne. Ji ber ku buhayê hilberîna kême û yê lêçûnê zêde ye di aboriyê de valahî rû dide û dibê egera hewcehiya domdar.

### Hêza kar

Li Kurdistanê pirbûna şeniyê ku bi çandinê radibe, dibe sedema sereke ya hêza kar a destvala. Ev yek, di heman katê de nîşaneyâ zêdebûna bêkariyê ye jî. Li bajaran jî pîşesazî ji bêkariyê re çareseriye nabîne. Lewre hêza kar diherike derveyî welêt. Metropolen Tirkîyeyê tevahiya Ewrûpayê, Rojhîlata Navîn İsrail û welatêni ereban, bâkurê Afrîkayê, Rûsyâ, welatêni Baltik û Asyaya Navîn warêni ku hêza kar ê kurdan tê bikaranî e. Kurd bêhtir di karê lêkirina avahîyan, çandin û barkeşiyê de dixebeitin ku ew kar kedeke mezin dixwazin. Hejmara kesen ku di warê tekstîle de dixebeitin jî ne kêm e. Kesen ku bi firoşkariya gerok radibin û karêni biçûk ên wekî tablekariyê di-kin, bi zêdebûna koçberiyê re bi bandordartir dibin. Her wiha hêza kar a kalîfiye ku ji xwendekarêni zanîngehan û kesen ku di şaxêni karêni teknikî de xwe gihadine û bûne pispor tê jî heye. Hejmara wan pir e û pêgeha xebata wan gelekî berfireh e. Li gel çalakiyêni kesen ku perwerdehiya zanistî girtine, yên wekî endezyar, bijîk, parêzer, aborîzan, mameste, hîndekarêni zanîngehan bo çalakiyêni esnafêni wekî berber, dirûnker, ajokar, çêker û hwd. jî agahiyê di warê xwe de pêwîst in.

### Kana zengîniya serdestêni kurd

Çavkaniya zengîniya serdestêni kurd her çiqas li gorî herêman û welatêni ku lê dijîn xwediyê hin cudahiyan be jî, bi giştî li ser heman esasî ye.

Taybetiya wan a hevbeş ev e: Xwedî erden berfireh in, ji binesaziya fedodalî û eşîri ji aliyê aborî û ramyari ve sûdê werdigirin, qezenza ranta bazîganiya sewalan û hilberîna çandiniyê, qezenza ku li encama hevkîyê bi serdestan re derdikeve holê; zordanî, karê tilyakê, pereyêni kirêt.

Her wiha asta pêşveçûna kapitalizmî û xweseriya erdnîgarî-aborî ya welatêni serdest wan ber bi çalakiyê din ve diajo. Bo nimûne, li Tirkîyeyê karsazên kurd ên bi karê turîzm, pîşesazî, lêkirina avahîyan, hawirde û hinardeyê radibin ên ku xwedî rîze-mâzaze re hene. Dîsa mirov dikare pêrgî dewlemendêni kurd ên li herêmên Bâkur-naferast-rojava bê ku nûnertiya pawanêni tirkan dikin, bi sazkarîna saziyên biçûk û nîvce re di gelek waran de ji bo pîşesaziya tirkan hilberîna fason dikin.

Zengînen bi eslê xwe kurd li herêmên ku li wan dijîn û seranseri Kurdistani tu daxwazîni ku di nava xwe de berjewendiyê çinî û neteweyî di-hewînin, naynîn zîmîn. Lewre hêza piştevaniya ku divêni, nabîni. Ev jî dibê sedem ku her û her lawaz û hewcedarî hêzên din bimînin. (Qediya)

# Rêzimanê kurmancî

- Wane 26 -

SAMÎ BERBANG

## Rayên lêkeran

**D**i kurmancî de lêker wekî rader têne bilêvkirin û di hevokê de ew awayê raderî wekî navdêr têne bikaranîn. Lê dema ji lêkeren resen qertafêr raderîn bê avêtin li tiştê ku li holê dimîne, ray (kok) lêker e. Bo nimûne, "kirin" awayê raderî yê lêkerê ye, di vê lêkerê de /-in/ qertafa raderî ye, gava ev qertaf bê avêtin raya lêkerê "kir—" dimîne. Ev ray her wekî diyar e, dema borî ya têdeyî dide dest. Ji ber vê yekê ji vê rayê re raya dema borî tê gotin.

Ev yek ji bo lêkeren resen derbas dibe, ji bo lêkeren pêkhatî mirov nikare heman tiştî bibêje. Ji ber ku ew di binyata xwe de ne lêker in. Wekî mînak di lêkera "revîn" de dema qertafa raderî /-in/ bê avêtin, li holê "rev" dimîne, ew jî bi serê xwe navdêr e û wateya ku em dibêjin nade dest. Ji bo dema borî ya têdeyî divê /-î/ yan jî /-iya/ bê dawiya wê, da ku bibe "revî/reviya", lê awayê di gerguhez ê van lêkeran ku bi "-andin" dema qertafa raderî /-in/ tê avêtin "revand" derdikeye holê. Ev jî dema borî ya têdeyî dide dest. Piştî van

agahiyan, mirov dikare li ser mijarê çend mînakan bide.

Kuştin kust

Hatin hat

birin bir

xistin xist

Ketin ket

Mirin mir

Ji bili vê raya dema borî raya dema niha jî heye. Ew li gorî her lêkerê diguhere. Ew lêker jî di dema niha de bi dest dikeve. Piştî ku lêkerek li gorî dema niha hate kişandin û qertafêr dem û kesan hatin avêtin, tiştê ku li holê dimîne raya dema niha ye. Wekî mînak em dîsa lêkera "kirin" bigirin. Lêkera kirin di dema niha de ji bo kesê yekemîn dibe "dikim". Li vir /di-/ daçeka dema niha ye, /-im/ jî her wekî berê jî li serê hatibû rawestandin, cînavkê pêrebestî yê kesê yekemîn e. Dema ev qertef bêne avêtin li holê tipa /k/ dimîne. Nexwe raya dema niha tipêk e. Ji bili vê mirov dikare çend mînakîn din jî bide, bi vî awayî jî mirov dikare mijarê zelaltir bike.

Hatin di-hê-m (têm)

Çûn di-ç-im

dan di-d-im

Mirin di-mir-im

Xistin di-x-im

firo(s)tin di-firoş-im

Ke(f)tin di-key-im

Kuştin di-kuj-im

Axaftin di-axêv-im

Bijartin di-bijér-im.

Biraştin di-birej-im

Di lêkeren pêkhatî ên negerguhez de wekî raya dema niha navdêr, rengdêr û hwd. a ku lêkerê pêk tîne dimîne. Wekî revîn, dema niha di-rey-im. Di lêkeren pêkhatî yê gerguhez de rewseke cuda derdikeye pêşberî mirov. Bo nimûne jî em dîsa lêkera "revandin" hildin dest.

Ev lêker di dema niha de bo kesê yekemîn dibe "direvînim". Li vir jî "-revîn-" wekî raya dema niha tipek e. Ji bili vê mirov dikare çend mînakîn din jî bide, bi vî awayî jî mirov dikare mijarê zelaltir bike.

## Bo lêkeren negerguhez

Cirîn di-cir-in

Zûrîn di-zûr-in

Firîn di-fir-in

Dirîn di-dir-in

Barîn di-bar-in

Êşîn di-êş-in

Her wekî ji mînakan jî tê fêmkirin, hinek ji wan rayan dengê peyvîn zîmînê ne, ji wan dengen lêker pêk hatin, hinek jî navdêr in.

## Bo lêkeren gerguhez

Cirandin di-cirîn-e

Firandin di-firîn-e

Barandin di-barîn-e

Reşandin di-reşîn-e

Kışandin di-kışîn-e

Rijandin di-rijîn-e

Xwendin di-xwîn-e

Mandin di-mîn-e

Wekî têbîniyekê divê em bidin zanîn ku di hin devokên kurmancî de /i/ya di raya van lêkeran de wekî /ê/ tê bilêvkirin. Yanê "dixwîne" wekî dixwîne" û "dimîne" jî wekî "dimêne" tê bilêvkirin.

## Ew nîjadperestî ye

MAHMUT KILINÇ



**D**i rojnameya Milliyetê rûpela dehan de, du nûçeye hebûn û hemû rûpel jî dagirtibûn. Rojnameyê, bi berfirehî cih dabû her du nûçeyan. Li jor, nûçeya li ser karkeren ji Kurdistanê ku ji bo çinîna findiqan heta bajarên li ber Behrareş çûne û biryara waliyê bajarê Orduyê Kemal Yazıcıoğlu ya ji bo astengkirina ketina nava bajêr bo karkeren kurd hebû. Nûçeya din jî der heqê merasîma bîrânîna Hünkar Hecî Bektaşı Welî bû û dînûçeyan da axaftina Serokomar Süleyman Demirel hebû. Di navbera her du nûçeyan de, eleqeyek gelek balkêş xwe nîşan dide.

Waliyê Orduyê ketina karkeren kurd nav bajarê Orduyê qedexe kir û yên ku ji ber qedexyan bi dizî ketine nav bajêr, bi zordarî bi destê polîsan derxistin dervayî bajêr. Hem jî, bi pêwîstiyek derewîn. Walî dibêje: "Kesên ku ji Başûrê rojhilatê Anatoliyê (Kurdistanê) ji bo çinîna findiqan hatine, vî karî baş nizanîn û zirarê didin dar û ber." Bi hezeran kes, di çadirê naylonî de bi rojan li ber ba û baranê bê parastin mane. Dîsa di çapemeniya tirkan da tê nivîsandin ku, ew kes wekî terorist têne súcdarkirin.

Nûçeya jêrîn jî; Demirel li navçeya Hecîbektaşî Welî sînga xwe bilind dike! û dibêje: "Di nav hemwelatiyên tirk de, ji bo bîr û baweriya dînî û taybetiya etnîk tu cudatî tune ye. Divê her kes di Tirkiyeyê de xwe bi çavekî hemwelatiyê di réza yekemîn de bibîne. Wekî ku Hunkarê Mexzin gotiye, bi hev re li ser riya biratiyê bin." Gotin xweş e lê, tu were ka ew mesaj ji bo kê ye? Walî Kemal Yazıcıoğlu, wekî raya giştî jî ji nezîk ve nas dike, berê Midurê Ewlekariyê Stanbolê bû. Li ser skandalâ Susurlukê, ew kirin welîyê bajarê Orduyê. Dema ku midur bû, bi xwe digot: "Ez suxtayê başbûx Turkeş im. Min ji wî re digot bavo." Dîsa tê zanîn ku, di dema midurtiya wî de li Stenbolê geleki insan bêdarizandin bi gulevîn polîsan hatin kuştin. Her wiha elmê wî digîhişt qilîriya Susurlukê jî. Jixwe, ewil wî veşart. İcraata wî, hemû li ber çavan e, ew kesekî nîjadperest e. Di dema darbeya faşîst a 12'ye rezberê de, di nav komên lêpirsîne da cih girt û lêdan û hegeratên ku li kesen girtî kirine hê nehatine jibirkirin.

Li dinê 216 dewlet hene. Ka bala xwe bidin hemûyan, li kîjan dewletê, hemwelatiyîn nikanin bikevin nava hinek bajaran? Wekî ku ji dewletekê din hatibin! Tu mînak tune ne. Mixabin, tenê li Tirkiyeyê ev bêhiqûqî heye û xasima ji bo gelê kurd e. Ka, Demirel qala wekhevî û biratiyê dike! Wisa dixuye ku yan Demirel wexta ku qala wekhevî û biratiyê dike kurd ne di bîra wî de ne û ji bo kesen din dibêje, yan jî wekî her dem dereweke bi boçık dike. Ji durûtiyê bêtir, ew neyartiya rayedarên dewleta tirk, rastiyeke eşkere dike: Rayedarên dewletê her çiqas qala biratî û

wekhevîyê dike jî, her dem jî, ji bo gelê kurd bûne xwedîyê fêleke xirab. Divê kurdên hevkarê dewletê jî, li ser van pêşveçûnan, rastiya gel û dewletê bidin ber hev, ji xwe re encamek jî wan derxînin. Divê bizanîn ku ew dewleta ku bi dil û can jê re alîkar in, bi çavekî xulamtiyê, an neyartiye li gelê kurd dinêre.

Bi derewan, rastiya dewleta tirk nayê veşartin. Jixwe, ji bo vesartina pîsî û pasiya dewleta tirk, ki, çiqas hewl bide xwe jî nagehîje tu encaman. Polîtikayê dewleta tirk, tenê bi devê Welî Yazıcıoğlu eşkere nebûne; her wiha, ji destpêka Komara Tırka û heta iro, ew polîtikayê nîjadperest bi zor û zîlm li ser gelê kurd hatine meşandin. Mebesta dewleta tirk rastiyeke din jî derdixîne pêş; wekî ku roj bi bêjingê nayê veşartin, ji layê civakî, kulturî, aborî, dîrokî û antropolojik gelê Kurdinan gelekî ji tirkan cuda ye û dewleta tirk ji bo desthilatdariya xwe polîtikayê gemarî û taybet di Kurdistanê de meşandine. Ev jî; kolonyalîzm e. Kolonyalîzma ne wekî ya dewletên Ewrupayê jî, hê tarît û nîjadperest.

Heger dewleta tirk, naxwaze ku gelê kurd biçe bajarê bakur û rojavayê Tirkiyeyê, ji bo debara xwe li kar bigere, divê dest ji polîtikayê xwe yên mîltîtarîst bikişîne; dev ji şewitandin û valakirina gund û bajarên kurdan berde; û ew jî ne bes e, divê ji Kurdistanê bi giştî derkeve.

Rewşa gelê kurd gelekî giran e. Hê di ser de gund û bajarên kurdan jî dişewitînîn, hildiweşînîn. Aboriya welêt jî, ji ber zor û zîlma dewletê gelek li paş maye. Dewleta tirk, bi hezar bêxerîyê di Kurdistanê da ye. Lê gotinek heye, "Hezar musîbet, dibe sedema xêrekê."

Bîranîn ji bo şehîdên Amedê ên avrêla sala 1996'an

# Pênc pilingê

## Geliyê Rizê



**S**erlekerekî hêja hevrê Cemal (Mahmut Gün), ez dixwazim der mafê serê Ehrîman û Ahûra Mazda de nameyekê ji we re binivîsim.

Ez dizanim niha hûn li me digerin. Rast e em gelek dereng man, hûn pir bi lez û xurt beziyan gihiştin azadiyê. Ez ji bo ku giran dimeşiyam negihîştîm we. Zindan tarî, çarhawîr dîwar û şîşikên hesin in. Bi dil û raman em ber bi azadiyê ve dimeşin. Lê belê bedena me girtî ye.

Di heyva avrêlê de ez çûm Ciyyayê Gozarekê. Em bi hev re gelek caran li wan waran geriyabûn. Hê di quntara Gozarekê de ez bi ser şopa we ketim. Şopa serleskerê mezin Rêheval Cemal li pêş bû. Rêçen serbazên hêja, hevrê hebûn; Hebûnê Dirêj, Lehengê Deşta Bismîl Egît (Zerdeş Menekşe), Cemşit (Ömer ...) û Rizgar (Necdet Özalp) li pey dimeşîyan. Her pênc pilingê Gelyê Rizê dabûn pey hev. Ez jî ketim ser şopa we û me-

şiyam. Min neqeba Gozarekê xelas kir, bala xwe dayê ji çiya bêhneke pir xweş dihat, Bayekî pir nerm dihat, ne bayê reş bû, ne jî bayê Bakur. Min li der dora xwe mîze kir, ba ji rojhîlat û rojava jî nedihat, ev babilûsk jî nîn bû. Vî bayî çawa li min xist, tu êş, elem û birîn di bedena min de neman. Ez bi serê giyê Gozarekê ketim, min berê xwe da Başûr, nav Gelyê Nebanê wekî bihuşte kesk, sor û zer dikir.

Di her newalekê de aveke zelal diherikî. Daran ku'lîkên xwe dawesandibûn, pelên mezin vekiribûn û dewsa gulan fêkiyên cur bi cur girtibû. Min li aliyê Bakur mîze kir, Gelyê Azadiyê (Gelyê Gömma Elo) bihuşteke din bû. Hin dar di nav darê gelî de hebûn, bêhna fêkiyên wan dihat heta serê gir. Çemê Sarumê bixîsim diherikî ji bo ku Dîjle hembez bike. Ez li we geriyam. Min bang kir, got: "Ez çawa bigîhîjîm we". We bersiv da. Got: "Tu dikarî li ser rêça me bimeşî, tu yê bigîhîjî me." Ez ke-

tim ser rêçê. Dewsa lingê we tev bûbûn Gul û Gülistan. Di şopa her lingekî we de bi hezeran sosin, beybûn, pîvok, pirpizek û hwd. şîn hatibûn. Şopa we kesk û sor û zer dikir, bûbû keskesorek, hetanî nav gelyê azadiyê dom dikir.

Ez gihiştîm nav gelî. Li bin dareke mezin rawestiyam. Min destê xwe avêt fêkiyeke bêhnxwes, min got ez birçî me, ez hinekan ji van bixwim. Ji nîşkê ve hevrîyekî bang li min kir, got: "Tu kî yî" ez lê vegeriyam ku, xortekî ciwan, keleş li milê wî, sê alên rengîn di desten wî de, di nav çavên wî de stîrka azadiyê û serfiraziya dicîrisî, pir xwînsîrîn, rûbiken û dilgerm bû. Min jê pirsî got: "Hevalê hêja navê te bi xêr?" got: "Navê min Azad Serfiraz", min dîsa pirs kir got: "Hevalê Azad Serfiraz, li ser gir, bayekî pir xweş dihat, ez pir nexwes bûm, canê min tev birîn bû, dilê min û kezeba min kul bû, wexta ku wî bayî li min da, kul û birînen min sax bûn.

Bêhna fêkiyên van daran jî dihat hetanî serê Girê Gozarekê. Bi vê behnê mirov têr dibû, wekî bêhna bihuşte bû. Heval, ka tu dikarî ji min re egera van bibejî?" Hevalê Azad got: "Heval ev bayê serê gir bayê azadiyê ye, ev dar jî darê azadiyê ne. Ji ber vê yekê, ev ba û ev fêkî dermanê tevî derd, kul û birînan in. Ba, ji kaniya azadiyê tê. Kani bi xwîna şehîdan diherike. Ev dar jî darê azadiyê ne, bi xwîna şehîdan hatine avdan. Riyêñ xwe kûr berdane bin xaka Kurdistanê. Ji xezîneyen bin xaka Kurdistanê bêhîn û tama xweş digirin û didin fêkiyên xwe. Bela wî tehm û behna fêkiyan hind xwes e." Heval axaftina xwe xilas kir ez bi dil û rih ketim ponijîneke kûr. Deng nedihat guhê min, çavê min der dora min nedidît, bêhna min çikiyabû. Heval deng li min kir got: "Heval ci bi te hat?" min got, "Hevalê Azad Serfiraz, wexta ku serlesker rêheval Cemal li vir ketibûn serê mezin, di nav berf û bahozê de di got emê lêdin "Heta ku pelên daran vebin". Ez îro bala xwe didimê, daran pelên xwe vekirine, fêkî girtine û fêkî têñ xwarin di bin dermanê tevî êş û eleman. "Heval li min vegeriya got: "Heval qey te serlesker Cemal nas dikir." Min got, belê heval ez şervanê wî me û hevalê hêzên çekdar ên heval Hebûn, Egît, Cemşit û Rizgar im. Em tev şervanê serlesker Cemal bûn." Rêheval Azad Serfiraz got: "Hevalê delal, pêwîst e ku tu ji min re qal û behsa van "Pênc lehengê Gelyê Rizê" bikî, ka gelo jiyana van lehengan çawa bû, ez pir bi nav û dengê wan hesiyame, dixwazim ku li ser wan pir tiştan hîn bibim."

Di dawiya axaftina heval de hûn hatin ber çavê min bi dil û mîjî ez li ser jiyana we fikirîm û min dest bi qala jiyana we kir.

(Dê bidome)

GIRTÎGEHA BARTINÊ

□ 22 gelawej 1985:

**Turgut Uyar çû ser dilovaniya xwe**

Helbestvan Turgut Uyar, di sala 1927'an de li Enqereyê tê dinê. Di dibistanen leşkerî de xwendina xwe kuta dike. Helbesta wî ya yekemîn di kovara 'Yedigün' de dertê. Di helbesten wî yên pêşîn de li ser kesan û bandora derdorê ya li ser kesan radîweste. Piş re helbesten xwe bi piramî li ser cîvakê û toreyen cîvakê bandora wê ya ku li ser mirovan radîweste. Di nav helbestvanen tirk de ên ku navê Kurdistanê bêtirs bi kar anîne û li ser vê mijarê sekinîne de kesê yekemîn e. Ew di 22'yê gelawejâ 1985'an de çû ser dilovaniya xwe.

**BÜYERINE JI DİROKÊ**

□ 25 gelawej 1900:

**Fîlozof Nietzsche çû ser dilovaniya xwe**

Fîlozof Nietzsche di sala 1844'an de li bajarê Leipzig'a Almanyayê tê dinê. Bavê wî papaz e. Hîn di biçükiya xwe de ew bala xwe dide ser wêjeyî û bi navê Germania kovarekê derdixe. Helbest û nivîşen wî yên wêjeyî di vê kovarê de çap dibin. Ev jî heta xortaniya xwe kesekî oldar e, lê hinek lêkôlînan dibe Xwedênenas. Nietzsche li ser hunerê jî disekinê û bi navê 'Bûyîna Tragedyayê', 'Di dema tîrajîk a yewnanan de ji felsefe û dîrokê sûdwergirtin û bikaranîna nebaş a dîrokê' pirtukan derdixe. Fîlozof di sala 1900'î de dimire.

# Piştî neh mehan ji nû ve Koma Amed



**K**oma Amed ku di bin banê Navenda Çanda Mezopotamyayê de xebatên xwe dididomîne ji ber ku salona NÇM'ê ji hêla polîsan ve hatiye morkirin, roja 15'ê gelawejê li Medkomê konserek da. Ev konsera Koma Amed, piştî nevberdayîna neh mehan, pêk hat.

Koma Amed di sala 1988'an de li Enquerê ji aliye çend xorten kurd ve tê avakirin. Pêşketina gelê kurd Koma Amed ji bi pêş de dibe. Bi vê pêşketinê re Koma Amed heman salê kaseteke bi navê "Kulîka Azadî" bi awayekî korsan derdixe. Bi pêşveçûnê gelê kurd re, dewleta tirk mecbûr dimîne ku di zagonên xwe de hinek guherînan çêbike. Bi vê guherandina zagonan ji aliye komên kurd ve kaset derxistin hêsan dibe. Ü koma Amed ku kasete xwe bi korsan derxistibû wê kasetê di sala 1990'î de dîsa bi navê "Kulîka Azadî" bi bandrol derdixe. Heman salê li dijî vê kasetê doz vedibe, lê di encama dozê de Koma Amed bi ser dikeve.

Pêşketina gelê kurd di warê çandî de jî xwe dide der. Di sala 1991'ê de vebûna Navenda Çanda Mezopotamyâ di warê çandê de valahîyeke fireh dadigire. Bi vebûna Navenda Çanda Mazopotamyayê, Koma Amed ji nêzîkê NÇM'ê dibe û di sala 1993'yan de tevlî saziyê dibe û xabatên xwe êdfî di bin banê NÇM'ê de dimeşîne. Di sala 1995'an de Kaseteke bi navê "Agir û Mirov" derdixe. Dîsa di 1997'an de bi navê "Dergûş" kasetekê derdixe. Di berga vê kasetê de wiha tê gotin: "Her nirxê ku hatiye afirandin, berpirsiyariyeke giranbuha dide ser

milên me û em, hunermend û stranbêjên kurd, dizanîn ku Mezopotamyâ duh çawa dergûşa çandan bûye, iro jî dergûşa şanazî û berxwedenê ye. Em bi vê felsefeyê, di vê riyê de ne. Hewla me ew e ku em di xebatên xwe de, bi berpirsiyariyeke dîrokî layiqî gelê xwe bibin."

Dîsa sal 1998, 15'yê meha gelawejê. Ji ber ku 31'ê tîrmehê de Bi îdiayeke komîk a bi rengê "Beyî destûr di salonê de filman pêşkêş dikin" salona NÇM'ê ji aliye dewletê ve tê morkirin. Ji ber vê, Koma Amed li Medkomê konserê dide.

Di konserê de xuya bû ku temaşevanen Koma Amed bêriya wan kirine, lewre jî salona Medkom mişt tije kiribûn. Ji ber ku endamên komê ji ber pirsgirêkên cur bi cur ji bêgavî koçî deverên din bûn, berî niha bi neh mehan dawî li konserên xwe anîbûn. Komê di nav van neh mehan xebatên xwe ji bo sazkirineke nû kîrin û bi besdarbûna du kesen nû ji nû ve dest avêtin xebatên xwe. Jixwe heta iro Komê ji ber pirsgirêkan her gav xwe nû kiriye. Kom niha bi çar kesan (Faruk gitar, vokal; Mübin ney, vokal; Serap gitar, vokal, solo; Turan baxlama, vokal, solo.) xebatên xwe didomîne. Piştî neh mehan dîsa li pêşberî gel e û stranen xwe pêşkêşî gel dike.

Koma Amed dide zanîn ku ew ji bo pêşxis-tina komê û zêdekirina endamên komê xebatên xwe didomînin. Ji bo pêşerojê jî didin zanîn ku wê konser û bernameyên bi vî rengî bidomin û ji bo repertuareke nû jî xebatên wan hene.

C. ANDOK/STENBOL

**ÇAVDÊRÎ****Festîvala Ciwanan****SERKAN BRÛSK**

E v du sal in ku Festîvala Mazlum Doğan a Werzîşê bi serkeftin tê lidarxistin. Êdî ciwanen kurd ên ku bi werzîşê dadikevin jî, ji ciwanen xelkê ne kêmtrîn in. Tevgera wan a neteweyî tevî van derfeten xwe yên kêm jî, dest diavêje sporû dixwaze ciwanan di vê mijarê de jî ji bo pêşerojê amade bike.

Dîsa dixwaze wan ji riyên xerab û neminasib bisitirîne. Nehêle ku ew têkevin xefkên dijmin û biyaniyan, ci ji destê wê tê teqsîr nake. Heta di van rojan de kampanyayeke berfireh jî li Ewrûpa daye dest-pêkirin. Ev kampanya ji destpêka meha gelawejê heta nîvê wê dê were meşandin. Ji bo meşandina vê kampanyayê geleb afiş û belavok hatine amadekirin û li gelek bajaran jî, her semîner berdewam in. Hemû saziyên me ên li van deveran jî bi awayekî xurt piştgiriya vê kampanyayê dikan.

Wekî dîn jî, dixwaze ciwanan bi moreleke bilind perwerde bike. Ruhê wan bi ruhê neteweyî re bike yet. Ruhekî neteweyî ku bi dehfdêr û faktorê hundîrin hatibe avakirin, ew ruh e, ku tesîra bîrdozân kedxwaran nikare cewherê wê xera bike. Yanî rola werzîşê li vir ne roleke tevizandinê ye, berevajî wê; hişyarkirina hêza hundîrin a ciwanan e. Ü ev giyana hişyarbûyî bi alîkariya tevgera şoreşgerî ber bi doza neteweyî diherike. Mirov dikare vê festîvala derbasbûyî ya duyemîn bi vî awayî binirxîne.

Lê mixabin ku ev derfet tenê li ber ên ku li Ewrûpa dijîn vedibe. Gelo ew sazî û dezgehîn li welêt û li metropolên tirkan, yan jî li Basûrê Biçük in, nikarin ji bo ciwanen kurdan organîzasyonên wiha li dar bixin? Ez bawer dikim, ku mirov karibe hinek festîvalen bi vî rengî li dar bixe dê bi dehan ciwanen kurd besdarî van festîvalan bibin. Dê ciwan bi riya van festîvalan bênen cem hev, hev nas bikin, bi hev re têkiliyan deynin, tecrûbeyen xwe ji hev re bibêjin...

Dibe ku niha ev derfet li metropolên dijmin zehmet bin û heta bê îmkan bin. Em dizanîn bê helwesta dijminê me li hemberî gelê me yên li van deveran çawa ye. Dijmin dixwaze bi hemû awayî ciwanen me bifetisîne û nehêle ew bi ruhê neteweyî yê ku nû tê afirandin re bibin yet. Ew êrîşa ku vê dawiyê birin ser NÇM'ê jî, mirov dikare di vê çarçoveyê di binirxîne. Ü em vê çalakiya hovane û lewîşî diricimîn. Ew desten ku mifte xist xilka deriyê dibistana wan û qewî kir, bila ji kok ve biweşin. Bila zarokên NÇM'ê ji bîra nekin ku ew kulîlkîn herî xweşik û birûmet ên neteweyî ne. Ew zarokên pêşeroja me ya ronî ne. Ew mezinîn asoya li serî lûtkeyen çiyayen me ne. Ew endamên jiyan azad a li welatê Kawa ne.

Ne tenê li welêt, li metropolên dagirkeran her wiha niha li Ewrûpa jî hino hino di bin re êrîşî saziyên me ên neteweyî dikan, dîsa di çape-meniya hinek welatan de kîn, dirûtî, derew û bextreşî tê weşandin. Her wiha êrîşa ku li hemberî televîzyona Medê hatiye kirin. Jixwe vê destdirêkirinê baş nîşan da ka bê buhayê yasayen Ewrûpa çend qurî in. Bê ku tu agahdariyan bidin, rîveberen vê saziyê, weşana wê li gorî dilê xwe dan sekinandin. Ew ên ku vê neyasayıyê pêk tînin, baş dizanîn bê televîzyona me ji bo gelê me û neteweya me ci ye û tê ci maneyê? Me ji ku dest pê kir û em di ku re derketin. Lê ya esasî ev e ku em divê li ciwan û zarokên xwe xwedî derkevin. Em jî iro ve li ser qehrî dijminan di hemû warê jiyanê de ber bi ruhekî neteweyî ve bi gavê xurt herin. Ev gav jî tenê di nava saziyên me ên neteweyî de dikarin pêk werin.

Dengbêj Salihê Şir

# Dengbêjî ji bo min evîn

*Em dixwazin pêşiyê we binasin?*

■ Navê min Salihê Emerê Cîhanî e. Navê diya min Xanim e. Em Şîrnexî ne. Ez di sala 1941'ê hatime dînyayê. Li derveyî Şîrnexê gel min bi navê Mihemed Salihê Şîrnexî dinase.

**Li ku dera Şîrnexê?**

■ Li navenda Şîrnexê dibêjin.

*Malbata we ji berê ve ji nava Şîrnexê ye?*

■ Malbata me bi navê mala Hesnê Hacerê tê zanîn. Emrê min hêj nebûbûçardeh min dest bi dengbêjiyê kir. Gotineke me kurmancan heye, dibêjin: Însanek ku dikanekê veke çi hebe yê wî bifiroşe. Di dikana me de çi hebû me jî ew firot. Me stranê xwe ji mezinê xwe, ji dengbêjên xwe yên eziz girtin. Ez ji çardeh saliya xwe vir de distrêm.

*Bi taybetî hûn bi kîjan meqamî dibêjin?*

■ Ez li ser meqamê, awazê Şîrnaxê dibêjin, me di dewetan de digot, li ser rûdanê şeran digot. Em bêjin tiştek li te bîqewime ezê hema li ser te stranekê bibêjim û derxim piyasê.

**Tu bi xwe kilaman dirêsi an?**

■ Erê. Mesela iro nexweşînek ji te re çêbû, min derdê te dît, hema derhal minê deest pê bikira û bigota.

*Stranê ku te digotin hemû yên govendê bûn?*

■ Li gel wan ên dîwanan, ên paleyyê jî hebûn. Piştî ku ez jî leşkeriyê vegeriyam ez yeqîn dikim di sala 1968'an meha gelawêjê de min li Unkapaniya Stenbolê kasetek derxist. Li ser plakê ez bawer im Güral Taç dinivîsî.

*Li ser kasêtê navê kîjan firmayê hebû?*

■ Gûral plak, navê xwediyê plakê jî Yaşar Özdep an jî Özerdem bû. Piştî ku min ev kaset derxist, di navbera sê heyvan de pir hate firotin. Wê hingê me li ser rehmetiyê M. Mistefa Berzanî got.

**Navê plakê ci bû?**

■ Navê plakê Dewran bû. Strana dewran wiha ye:

*Dewran e dewran e  
yê ku rabû jê re dibêjin Mele Mistefa Berzan e  
di kal û bavêن xwe de  
digerin li heqê me kurdan e.*

*Tê wê demê tenê plakek derxist?*

Ji min re wekî hesretê bû, wekî nexweşîneke bû, li ku dewatek, şahiye hebû, ez diçûm wir min li kilam û stranan guhdarî dikir. Heta ji bo vê ez rojekê cûm Patnosa Agiriye jî. Ez bi hinceta bazirganiyê cûm. Lê piştre min mebesta xwe diyar kir. Bi ya min li tevahiya Kurdistanê ji Hecî Evdilkerîm û Mûrado zêdetir û baştir dengbêj tunene.

■ Min du plak derxistin. Her du jî di heman rojê de çap bûn.

Di her kasêtê de deh stran hebûn. Li ser vê plakê milek Dewran bû milek jî Kerem Axayê ciberî bû.

*Ev stranê ku te digotin ên te bi xwe bûn?*

■ Belê helbest ên min in, çar heyy piştî çapbûna plaka min a bi navê Kerem Axa li Sêrtê ereban giliya wê kir.

*Plak li Sêrtê jî hate firotin?*

■ Belê li gel wê li seranseri rojhilatê Kurdistanê jî hate firotin. Îcar min di straneke xwe de gotibû:

*Dewran e dewran e.*

*Li hewayê, ezmanan min di girîna*

*teyran e.*

*Li erdê*

*Heger xwedê bêje erê  
Emê Diyarbekira rengîn bikin paytaxtê kurdan e  
pêşmergeyên me yêñ giran kirin  
hevdu dane  
serê ereban jêkirin  
cendekê wan avêtin pey maşîne qâmera ne  
di nava Mûsila rengîn re diborîn  
hinekan digotin eva ci kes in  
ci însan in*

Xortekî çardeh salî li wê derê rabû got:

Hey mal we şewitîno, ma hûn nasnakin.

Berê xwe bidin milêwan hemî

rutbê zabitên ereban e.

Evana fesat û şeytanê herdu dînan e

Li ser vê kelîma erebî giliyê vê plaka min kîrin û ez hatim girtin.

*Hûn dizanîn gelo wê demê ji wan çend heb hatin firotin?*

■ Bi texmînî zêdeyî 150 hezâr heb hatin firotin. Dema ku ez hatim girtin xuya bû ku hemû dosyayê min hatine girtin, ez naxuyêm. Ez cûme urfî idareyê. Ez li Sultan Ahmeda Stenbolê ketim mehkemeyê. Piştî mehkemeyê ez cûm Beyazidê ji bo ku ez plakçiyê xwe biguherîm. Ez cûm firmaya xwe, ez li wir hatim girtin û ez birim avêtin nezaretê.

*Hûn hîç li ser vê yekê hatin gitin?*

■ Li ser vê yekê ez sê rojan di nezaretê de mam. Çawa roja ku ez hatim girtin, wan ez birim mehkemeyê. Gotin dosyaya wî hatîye girtin. Çuye Urfa idareyê ji Urfa idareyê şîyê derkeve ez nizanim. Dema ku ez ji mehkemeyê derketim. abûkateki ez dîtim. Ji wan re got, we ev li ser ci girtiye? Wan got, li ser siyasete ye. Siyaseta ci? Wan got li ser kurdîtiye ye. Abûkat di heman kîliye de navê min nivîsî, abûkat got hûnê vîbi ku de bibin. Gotin emê bibin nezaretê sibê bînin mehkemeyê. Sibetirê ez anîm mehkemeyê di heman kîliye de min abûkat dît, li gel wîneh abûkatê din jî hebûn.

**Ew abûkat kurd bû?**

■ Nizanim, ez niha jî derheqê wî de tiştekî nizanim, wî nas nakim. Abûkat ji min re got dêwa te ci ye? Min got dêwa min li ser Mele Mistefayê rehmetî ye. Got temam. Lê, netirse tiştek tune. Îcar em çûn Urfa idarê plaka min jî li daîrê bû. Em çûn hundir. Hakim got ci bû abûkat beg, xêr e. Abûkat got ev muwekilê min e, ez hatime ka ci dêwa wî heye. Hakim got, ev kes li ser siyasete haîtiye girtin, wî plak çap kiriye. Di plakê de doza Kurdistanê şopandî.



EXI:

# ke mezin e

Hal û mesele ev e. Di kasête de gotiyê Dewran e Dewran e.

Abûkat got: Ji kerema xwe em dikarin plakê guhdarî bikin. Pişti ku me plak guhdarî kir, abûkat got birêz hakim li Şerqê ci mirovê ku Quranê bixwîne navê wî Mistefa be, dibe Mele Mistefa. Ger tu bawer nakî were em herin Şerqê ezê jî te re sed mele Mistefa peyda bikim.

Hakim got: Dibêje emê Dîyarbekirê bikin paytext, rejîma tirk ji holê rakin.

Abûkat got: Ew ne delîl in.

Hakim got: Dibêje dewran e dewran e. mîrik resmen gel teşwîqî dewrîmî dike.

Abûkat got: Em bi tirkî nabêjin yar yar. Li şerqê jî dibêjin de yar de yar. Lê hûn wekî dewran fêm dikin. İcar di navbera wî û hakim de nîqas derket.

Abûkat got: Hûn ji kesen ku dewletê dişelînîn re tiştekî nabêjin. Feqîreki hatîye ji bo ku zikê xwe têr bike çend kilam gotine. Hûn wî didarîzînin.

Hakim got: Baş e. Lê, divê plakan dernexe, sê mehan li vir bimîne û her roj bê îmzeya xwe dayne.

Li ser vê abûkat itîfraz kir û got baş e hûnê hemî mesrefen wî bidin.

Hakim got: Na ez nadim. Pişti vê hakim got divê pazdeh salan tu plakê dernexe. Dema em derketin ber dêri abûkat ji min re got:

Here Xwedê silametê bide te. Dîsa bistrê netirse.

Lê bila plakên te bi awayekî resmî dernekevin.

**Pişti wê we tu plak dernexistin?**

■ Na. Min plak dernexestin. Lê min di nav gel de, di dewat û dîlanan de got.

**Ji wan plakan di destê we de he-ne?**

■ Ez bawer dikim li Şîrnexê hebek heye.

**We di dengbêjiyê de ji ci tesîr girt?**

■ Ji min re wekî hesretê bû, wekî nexweşîneke bû. Li ku dewatek, sahiyek hebû, ez diçûm wir min li kilam û stranan guhdarî dikir. Heta ji bo vê ez rojekê çûm Patnosa Agiriyê jî. Ez bi hinceta bazırganiyê çûm. Lê piştre min mebesta xwe diyar kir. Bi ya min li tevahiya Kurdistanê ji He-

✓ Dema ku ez ji mehkemeyê derketim, abûkatekî ez dîtim. Ji wan re got, we ev li ser ci girtiye? Wan got, li ser siyasetê ye. Siyaseta ci? Wan got li ser kurdçîtiyê ye. Abûkat di heman kîliyê de navê min nivîsi, abûkat got hûnê vî bi ku de bibin. Gotin emê bibin nezaretê sibê bînin mehkemeyê sibetirê ez anîm mehkemeyê di heman kîliyê min abûkat dît, li gel wî neh abûkatê din jî hebûn.



cî Evdilkerîm û Mûrado zêdetir û baştır dengbêj tunene.

**Li herêma Şîrnexê kesen ku we bi taybetî jê tesîr girtine, kî ne?**

■ Min ji Mehmedî Hesenê Kîlorî, Mihemedî Mehmedî, Ehmedî Feqe hwd tesîr girt. Ez di sala 1971'ê de ketim girtîgîhê. Min strana bi navê "Mala min mala mîran e" di Hepsî Wanê de got. Du celebên vê stranê hene. Strana ku niha Şîvan dibêje min li ser xwe gotiye. Stran wiha ye:

*Mala min mala mîran e  
konê mala bavê min konê ferx û şêran e*

*çawa destê Ferxê Emer avêtin bêx-  
weyê kelepçan  
berê wî dane hepsa Erziromê  
berê zar û zêçen wî dane  
pêşiyê derê guhê gundan e.0*

**Meqamê ku hûn dibêjin û yê strana ku Şîvan dibêje yek e?**

■ Na. Di navbera herdulan de ferq heye. Pişti êrîşen li ser Şîrnexê min li ser çeteyan jî stran gotin. Min bi zimanekî nerm ev stran ristin. Bi-rayen min, çavê min werin vê yekê nekin!

**Hejmara stranê we çend in. De-**

**ma ku li ber stranê we kaset bêne dagirtin dê çend hebûn tijî bike?**

■ Dê gelek kasetan tijî bike.

**Hûn dikarin navê çend stranê xwe bibêjin?**

■ Belê. 'Dewran e', 'Kerem Axa', 'Ebûbekir Axa', 'Adil Begê Mûksî' hwd.

**We stranê govendê jî çêkirine?**

■ Belê min zaf çêkirine mesela.

*Min dîlan kir*

*Te dîlan kir*

*Ey lê dînê dîna min*

**We di mal de hetanî niha qet ka-sêt dagirtine?**

■ Belê min pir çêkirine.

**We di civatan de stran gotine?**

■ Belê. Min di civatan de pir stran gotine. Di civatekê de dema ez distirêm li ber min gelek kaset têne dagirtin. Dema ez di sala 1959' an de çûme Mûksê min bê navber bi setan stran gotin.

**Li dora we bi navê payîzok cele-beke stranê heye. Hûn wan jî dibêjin?**

■ Belê kêm zêde ez wan dibêjim.

**Daxwazeke me ji we heye. Hûn dikarin ji me re straneke xwe bibêjin?**

■ Ez dê niha straneke Evdalê Zeynikê bibêjim. Stranê Evdalê Zeynikê hem helayetî têne gotin, hem jî bi kilamkî.

*Lê lê Evdalê Zeynê dibê  
wezê Evdal bûm Evdalê Zeynê  
ê ê hê Evdal*

*Lê lê wezê dengbêjê Surmeli Memet Paşê bûm*

*de wezê vê tiriyê qîza û bûka bûm ho  
Evdal*

*De sala vê salê çavê min kor bûne  
çeng û perê min şikestine  
wezê hêsîr û belengaz mayî me Evdal*

*Ax ez xirabmalê te me Evdal  
ez hêsîro lo bêriya te me  
Ez hêsîrê lo bêriya te me  
de rabe Temo lo lawo mirin xwestir e*

*ji vî halî  
lê lê Evdalê Zeynê dibê Temo lawo  
rabe lezke bilezîne ê ê hê Evdal  
lê lê de tu çengîlê bavê xwe bibe ser  
şêxa, doqtor û hekimê loqmanan bi-gerîne.*

MÜLAZIM ÖZCAN

# "Rûyê te galeriya êş û janan"

Bernedin destê hezkirin û birativê  
Goyan e\*

ev bajarê lix şuna bêhn  
kul û keser dide û distîne  
ev dîwarên ku

te bi wêneyên hesreta xwe  
xemilandî  
ev keçika bejinzirav û lawaz  
ku we mil daye milê hev

çiyayên asê

deverên

qad

beyar

kevir û ax

mêş û moz

seranser

ev welatê

rengîn û

wekî bîhuşt

xemgînî û gumanî nemaye

bîye dû û belav bûye

zîlm û zordarî

çiqas em li ser katê ketibin

û meşyabin

bewestan

û

me bernedabe

destêñ hezkirin û biratiyê.

Li vî bajarê ku bêdengiyê dihebinê  
bi serê xwe, tenê û bi birîndarî  
rûye te bûye galeriya êş û janan  
destêñ te di xerîbiya kar û xebatê de  
ye.

dil jî di êsêke dijwar de  
bêsekîn

xwîn jê diherike.

wê hilweşê dîwarê ku xem û keserê hû-  
nandî

wê hebe deriyên ku li ser dengê te hatine  
girtin

dev jî xwe bernedî

nekevî xûvê

ji reşreşikên şevê

Êdî bêjim

tu min bipirsî

bi dilekî germ

û tijî

dijîm.

helbestan dinivîsim

bi gulên azadiyê xemili

zikê şevê jî li ber dev.

Berken Bereh

\*Goyan: şahid

## Welatê Min

(Hezkirin)

çimkî ji te hez dikim

.. û hezkirina te

di bihara

dilê min de

ges e

min navê te nîvîsî

- û min

pesindariya te (xwe) dikir

li ser destikê

sûrê xwe yê kevnar

sûr piçiğî

rabû ser xwe

divê

xwe

rizgar bike

bi  
destê min

Ciwanê Abdal

## Verê Dîjle de bêriya to

Inadê aw û heriknayı ra  
mase xo dano awro  
û roşin, tarî keno vîla  
Gava şan ageyreno rengê boyâ titûnê hî  
Hewayê ku şîrgerm to ri xo bar keno  
û diyarê 'Kela Ben û Sen' i resneno çê-  
manê min...

Amed Gelawêj e  
Gelawêj Amed e.  
Amed tenûreke sincirî  
Û dilê min gudek hevîr e  
Di nav lepén diya sêwiye  
Dipijine nanê genimî yê jî rengê xwe  
Bi sebra Eyub Pêxember  
Nan dipije  
Dil dipijin....  
Tu bi hesreta dilê xwe û min biki  
Rast bêje min, Amed  
Ez dibim biyani  
Yan tu kirâsê xelkê li xwe dikî?



Seserano ke yaw dêre hawa sekê qîn-  
celan de

Bi vengo lîrik û nefeso derg ê dengbê-  
jan

Ku tu kes te ra fam nekeno...

Keynamasiyanê ri aşmînan

Ku porê ïnan asteran ra hiyo

Xo bi awa Dîjle ya lêla şonê....

Fahîm Kaya

## Qêrîneke Gelawêjî

Di kele kel germa havînê de

Kela Amedê

Dikele,

Dihele....

Ji hêlekê ve qêrîneke Gelawêjî  
Betana guhê min diçirîne,  
Ji hêla din;  
Bêhna Balî û Tîner û.....  
Li qorziyên kuçeyên te yên labîrentî  
Di gewriya zarokên beravetî de  
Bêvila min dixitimine.....  
Ji hêlekê ve dişewitin kevirên Qerecdaxî  
Ji hêla din;  
Wuş kele, ma bana nesi(1)  
Ez qurbana çavêr te yên rengbazaltî  
Ez di bextê te de me looo,  
Ka bêje min;  
Ma sen nêreye gidisen?(2)  
Ava Dîjle Çemê Pîroz  
Ka bêje min;

Hanê Hessosî deliqanliydx, babam? (3)  
Petêxên Mêrg Ahmedê  
"Derên wan zer e, hundirê wan kum-  
ne"  
Li Taxa Ofisê keç xwe li ba dikin  
Bi dawa kin  
Bi porê kin  
Niha bi rengezerek biyani kejik in  
Qerehubirê Hewselfi bi lêvan vedizel-  
qin  
û diherin, dizivirin  
Xortanî koçber bûye  
Dil winda ye  
Gul nema ye....  
Serê mizgeftekê, qibleyek  
Mele li paş, cemaet li pêş  
Minber berevajî, minare qilopanî....  
Ger ne ji wê bêhna titûna tijû bûya jî  
Di ser keleha kavil re  
Xwe digihîne bêhna min  
Minê ev dilê xwe yê wekî gundekî se-  
witi û wêran  
Parçe parça bikira  
Li ber guleyên neçîrvanekî segman  
Minê ev dilê xwe bikira hêlinâ qulin-  
gan  
û minê bidaya ber tîrîn li kevana  
Awirêñ keçekte bedew û gewre ya  
Amedî barkirî ne  
Ku ne ji wê bana.....

Roşan Lezgîn

## Têbinî:

- 1- Wuş de lê, ma ji min re çi
- 2- Ma tu bi ku ve diherî?
- 3- Kanê em mîrxas bûn, bavê min!

## Daw


Ciwanpîr  
dizanim,  
te dil kir kovan  
tasa xérâtê û zîncîrkirî bi kaniya xeman  
ve.  
Her karwanek-  
diz  
feodal  
pêxwas,  
büroqrat  
bi te ve bîhurîn  
tasek ava zemzem bi ser xwe ve dakirin, ji  
berfa porê te  
li dewsa tiliyan dimsa kîmyewî  
û li ya lêvan wêneyek- nîkotîn-  
çirek sîr  
çend şîret,  
û dîlokek qurmucî  
te bizarre kir li ser gomê jîna  
li zivistanek bêbînî,  
bo destê min bimîne her bi dawa te ve.  
du lingê eletewş bi ser me de ketin,  
pengizîm gorepana bajaren nenas- mîr-  
xasen pînikan  
û niha qursikek tenê maye di cilxê tiliyên  
min de  
ji dawa te û wêneyê te yê bûkanî  
di quncikê tenha ya dilê min de  
cendekê dawa te  
li ber lingê şûşa ereqvexurekî  
bazik li serî rapêçaye,  
ma nîv dîkek dikare ci bike ji vê pê ve  
bo bibe dik?

H. Kovân Baqî

## Li Navenda Çanda Alternatif

- 22.08.1998 şemî: Panel: Amadekar Înstituya Kurdiya Stenbolê "Diroka Kurdan a Berxwedanê", saet:17.00
- 23.08.1998 yekşem: "Teatra Jiyana Nû" saet:13.00 Gotübêj: "Enternasyonalîzm û Welatparêzî" Beşdar: Mihri Belli, saet:16.00
- 26.08.1998 çarşem: Film: "Ew jî dayikek e" Derhêner: Teryy George saet:18.00

## ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ




## Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Îzmirê

- 22.08.1998 şemî: Semîner: "Sosyalîstan li ku derê şâsi kir" Beşdar: Fikret Başkaya (Ji Zanîngeha Azad) saet:18.00
- 23.08.1998 yekşem: Konsera Koma Tofan "Sura Welat" saet:18.00
- 28.08.1998 în: Semîner: "Zargotin" Beşdar Mustafa Borak, saet:18.00 Li Navenda Çanda Tohum
- 22.08.98 şemî: Tyatroya Ankara Birlik 'Qralek Xweşik Ne bedew (Bir Güzel Çırkın Kral)', saet: 19.30
- 23.08.98 yekşem: Filmê 'Dilê Wêrek (Cesur Yürek)', saet:18.00

Konferansa zimanê kurdî tê lidarxistin

# Gaveke din a dîrokî



Mehme  
t Emin  
Pencew  
înî yek  
Ji  
amedak  
arêñ vê  
konfer-  
ansê  
ye.

**I**nstituya Lêkolîn û Zanînê ya Kurdi ya Berlinê der heqê konferansa duyamin li ser zimanê kurdî de daxuyanî da. Di daxuyaniyê de derheqê koferansa zimanê kurdî de van agahyan didin:

Ev hewldana dîrokî ya ku di pêşengiya Înstituya Lêkolîn û Zanînê ya Kurdi de dest pê kiriye ji aliye zimanzanê kurd, sazî, organên çapemenî û weşan û ronakbîrên kurd ve eleqe û piştevaniyeke mezin dibine. Ev hewldan ji aliye M. Emin Pêncewîn Hüseyin Kartal, Îzedîn Naso, Zerdeş Haco û Sabri Agir ve dest pê kîr. Pişî re wekî komîteya amadekar civîna xwe ya pêşîn a fermî di 11.07.1998'an de li Berlinê li dar xist. Pişî civîna pêşîn a komîteya ku ji M. Emin Hewremanî, Hüseyin Kartal, Zerdeş Hajjo, Amed Tigrîs, F. Melik Aykoç, Munzur Çem, Îzedîn Naso, Selim Biçük, M. Emin Pêncewînî, Medeni Ferho û Sabri Agir pek tê, komîteya amadehiya konferansê hate sazkirin.

Komîteya amadekar civîna xwe ya duyemîn, bi beşdariya M. Emin Hewremanî, Hüseyin Kartal, Zerdeş Haco, Amed Tigrîs, F. Melik Aykoç, Munzur Çem, Îzedîn Naso, Lerzan Jandîl, M. Emin Pêncewînî, Medenî Ferho û sabri Agir li Berlinê li Navenda Înstituya Lêkolîn û Zanînê ya Kurdi li dar xist. Di civîna yekemîn a fermî de li ser pêwîstiya konferansa zimanê kurdî, pirsgirêkîn zimêñ, peywirêñ ku di vê bi lez û bez bêñ bicihanîn, hate rawestandin. Her wiha bo çareserkirina gelemseyen zimanê kurdî, zaravayen kurdî, standartkirina zaravan, zelalkirina pêwendiyen di navbera zaravan de, pêkanîna yekîtiya zimanê neteweyî li ser avakirina saziyekê û pişaftinê, nîqaş hatin kirin.

Di encama van gengeşîyan de bo ku arîse bi berfirehî bêne nîqaşkirin û çareseriyeñ bingehin ên lezgînî bêne dîtin biryara konferanseke

Di civîna yekemîn a fermî de li ser pêwîstiya konferansa zimanê kurdî, pirsgirêkîn zimêñ, peywirêñ ku divê bi lez û bez bêñ bicihanîn, hate rawestandin.

ku di 12-14 reşemiya 1999'an de bê lidarxistin hate girtin. Mebesta konferansê ew e ku zimanzan û ronakbîr sê rojan li ser hev li ser gelşen li ber wan gengeşîyan bikin û çareyên berbiçav peyda bikin.

**Babetê ku komîteya amadekar ji bo nîqaşkirinê zelal kirine ev in:**

- Dîroka zimanê kurdî
- Pêvajoyêñ guherîna zimanê kurdî
- Pêwendiyêñ kurdî digel Zend Avestayê
- Politikayêñ zimanê kurdî
- Gelşen kurdî
- Nêzikirin û pêşvebirina zaravayan
- Pêwîstiya saziya zimanê neteweyî û pêkanîna wê
- Çareseriyeñ li dijî pişaftina li ser ziman û çandê û erkên me.

Dîsa dê di mehîn rezber û kewçêrê de li van welat û bajarêñ jérîn civînen agahdarkirinê bêne lidarxistin.

**Berlin:** Di navbera rojêñ 01.09.1998–01.10.1998'an de li Înstituya Lêkolîn û Zanînê ya Kurdi (Berlin)

**Brûksel:** 26.09.1998

**Koln:** 03.10.1998


**Hanover:** 03.10.1998

Komîteya amadekar di belavoka ku daye de daduxuyîne ku hetanî niha du civînen ferrî lidar xistine û dixwaze ku hemî kovar, rojname, sazî, weşanxane, partiyêñ ramyarî û ronakbîrên kurd beşdarî konferansê bibin û di saziya zimanê a ku dê bê sazikirin de cih bigirî. Her wiha komîteya amadekar dê derbarê konferansê de hemî kes û saziyan agahdar bike û ji bo ku tê de bi awayekî çalak cih bigirin bang li hemûyan bike. Dîsa komîte diyar dike ku ji bilî vê banga fermî hemû sazî û têkildarêñ vî karî xwedî gotin û biryar in û ji bo sazkirina pêwendiyen di vê dereng nemînin.

AZADIYA WELAT/ BERLÎN

## TİŞK

Gamêde  
newiye



## LERZAN JANDÎL

**S**ake êno zanayene, dîroka her şarî de roj û demê zaf bi qedrî estê. Dîroka şarî ma de jî nê roj û demî estê. Nînan ra ya bi rumetire roja 15'ê Axustosê (15'ê Tebaxe) wa. Na roje sarewedardayena şarî ma de kemeranê bingeyînan ra yew kemer a, ke mordem ganî rûmet û qedrê daye û kesanê ke na roje de wayirê ked û emegiyê, bizano. Ebi na baweriya ma na roje şarî ma rê pîroz kenîme û verê kesanânê ke na roje de wayirê ked û emegê, ebi hurmet anime xo vînî.

Gelê demo yew înisiyatîfêdê Înstitutsyonanê kurdan derheqê ravêrberden û nêzdîkerdena zaravanê kurdi, vireştena ziwanê kurdi de esto. Ebi nê armancî roja 8.8.1998'de Înstitutê Kurdi seba zanayena û wekintene (Înstituta Kurdi ji bo zanîn û lêkolin) de yew pêseramayena viraziye. Ez bi xo ç iyê ke na pêseramayene de amê rî ziwan/zon, çîyanê ke hetanî nika amê vatene ra tayîna zêde ebi qedrî vînena.

Angorê diyena mi roşnavîrê ma, ziwan zanoxê ma her demîra zêderî raşîya şarî ma, raşîya ziwanê ma vînînê û dîroka ma ra derse gên/cênenê.

Kesekê hetanî nika zaf tûj bî, çîmiyî ya siya ya sipê diyêne ewro ê jî miyanê s iya û sipêy de tonanê bînan vînînê û angorê realîteya şarî ma, ziwanê ma fikranê xo newe ra vurnenê.

Bê guman naca mesela hetanî nika jî şexsî nêbiyê, la belê angorê fikranê tayê kesan, ti vana, qey mesela seba dînan şexsî biyê. Hemo ewro na baweriya şâşê ama şîknayene, baweriyaêde raşte serê nê kesan de ama viraştene. Na, ebi baweriya mi, nîşanê xovurnayene, ravêrşiyene, raşîya şarî xo diyen a, Seba naye jî gamêde girs a. Hêviya mi a wa, ke nê gamê niyanê tim bêrê eştene.

Wuniya na miyan de, yanê rojanê 14-16.8.1998'de Stockholm de yew pêseramayenêde bîne viraziye. Na pêserama yene seba kovar Vateyî amê viraştine. Seke êno zanayene a çend seriyo (pêseramayena 5) kesê ke kovara Vateyî vecenê, seba standardnayena /standard kerdena zarava Kîrmâncî/kirdkî û seba nêzdî kerdena zaravanê kurdî ênê pêser.

Bê guman wendoxê ma benhemmanê/encemanê na pêseramayene kovara Vateyî de şîkînê biwanê. Naca de, yan jî na meselîye de çiyo tewr muhîmtir o wo, ke her kes xo het ra seba nê çî, yanê standardnayena zaravan, nêzdîkerdena zaravan û viraştene ziwanêde şarî bixebeziyo, hetkariya yewbînî bikero.

Seke êno zanayene, na derhexq de jî, seke mi cor jî vat, her çîqa ke ravêrşiyene neweyî este jî, qelsiyê ma hona jî estê. Kesê ma gegane zaf teng fikrinê. Geganê teyna xo, derûdorê xo, hetanî dewa xo fikrinê. Ebi naye jî nêvindanê, xo çîyan pêrîne miyanê de vînînê. Na jî bena asteng, ke kar û gurê ma ravê şoro, ma bişikîmê, ence-manê/berhemanê emegê xo bigêrime/ biçêrime.

Hama ez bawer kena, ke na gama pêyêna ke hatê Înstitûsiyon û gelê kesanê kurdan de ama eştene, şîkîna nê kemas iyan/kêmanîyan û tengasiyan pêrîne tayê bikero serraş perspektîvanê new iyan bidero ma.

# NAMEK JI WELAT

Hevalan Delal:

Ez bang li hevalan xwe dikim! Ez zarekefi Kurd im, li ser erde xwe bume koçber. Salê min biçük e, lê jiyana min giran û dijwar e. Min ji weki piraniya zarokên Kurda, mafen jiyana zaroktiye neditiye. Lê fro ez baş pê di zanim ku, cima welatê min zarok tê ne kuştinê, tazf û rût in, birçlî û belengazin; li kolanen bajaran neçar dimin.

Ez baş dibinim ku fro dewlet ci tine serê me. Lê bila ev kedxwarana bizanibin ku, fro li welatê min artêşa zarokan ji he ye. Edî em keviran, bi çekan dilifzin. Weki bahozin li ser erde xwe.

Emê heyfa hemû zarokên cihane ji kedxwaran hilinin. Hemû zarokên azadixwaz, berê xwe bidine welatê min. Hün ji werin tevli me bin, da ku em tev ji bindestiyê xelas bin, û bi welate ki serbixe û azadşabin.

Silav ji zarokên bindest re!

JI QAMPA ETRÔŞE  
BERXWEDAN BOTANI



İRAQPEYVİN

## EZMEDTV HEZDIKIM

MED-TV vebû. Disa li ber dikanen antenan mirov bûne rêz. Dikanek de zarekek li sali bi sahi û kâfxweşîya xwe, pir bala me kîşand û me ji pêre li ser MED-TV peyvînek çekir. Niha em vê peyvinê pêşkêsi we dikin...

A.Welat: Merheba, navê te çiye  
Brûsk: Navê min Brûsk e.  
A.Welat: Tu li vir ci dikî?  
Brûsk: Antena me xera bû, me ji bo temirê anîye.  
A.Welat: Tu pir ji MED-TV'ye hez dikî?  
Brûsk: Erê, MED-TV zimanê me ye.

A.Welat: Tu kijan bernamê zehf hez dikî?

Brûsk: Bernama Nû Buhar û Sox û Şeng pir hez dikim.

A.Welat: Tu Nûceya û bernama Welatê Rojê tema-je dikî?

Brûsk: Erê erê! Ez ji bernama Welatê Rojê pir hez dikim.

A.Welat: Çima? Tu ci jê fêm dikî?

Brûsk: Ji ber ku jiyana şervanen derdikeve, û çekê wan ji pir delal in. Çend hevalan temeê min de, biçük ji derdiketin; çekê wan ji hebû.

A.Welat: Tu dicî dibistanê?

Brûsk: Na, ez naçim dibistana Tirkân. Lê belê ez li ber bernama Nû Buhar zimanê Kurdi fêr dibim.

A.Welat: Ji mala we, tu tenê bi zimanê Kurdi fêr dibî?

Brûsk: Na. Ez û xwişka min Zilan û Erşen fêri



## DİMENEK JI JIYANA ZAROKÊN KURDA

Dema zarokên Kurdan çavê xwe li cihanê vedikirin, xwe di bin sfya çekê leşkera didtin. Jiyana wan tim bi tirsandina leşkeran berdewam dikir. Dema zarok digiriyan, dayika wan ji wan re digot: "Tu nesekinf, wê leşkera werin te hildin. Emê te teslimê leşkera bikin." Bi van gotinan zarok ditirsandin. Zarok he ji biçûktiya xwe da, diketin bin bandora tırsa leşkera. Dema bi sala ve diçûn û mezin ji dibûn, mirovên tırsonek ji wan derdiket. Dema ku leşker dihatin, dest û lingên wan dilerizin û zirav li wan diqetiye. Edî qet kerf tu tiştekê nedihatın û liber tu ेrişan nikaribûn xwe biparâzin.

Belê; dema dirokvegera Kurdan 84'a û şûn de, rewşa zarokên Kurdan ji hate guhartin. Vê carê dema ku ji dayîkên xwe re bûn, çavê xwe di bin sfya çekên şoresserên Kurd vekirin. Bi axaftinê şoresseran, rastiya xwe dîtin. Bi lîstoka çekên gerilla, tırs ji ser xwe avêtin. Xwe bi hembêzkirina gerilla û evîniya şoresseran nas kîrin.

Ci dihat bıra zaroka, ji şoresseran dipirsın. Digo-tin: "Hün leşkera ki ne? Gelo kesek bi we dikare? Em na-xwazin hün ji vira herin. Cima her tim li cem me nasekin?" Pırsen xwe berdewam dikirin û zû bersiv dixwestin. Di hîn mijaran de, xwe diavêtin pêş û bela xwe ji gerilla venedikirin. Digotin: "Heval, bi Xwedê divê hün min ji bi xwera bibin. Heval, ev çek bila jîmîn ra be. Da ez pê dijmin hikujim." Dema neyêni ji gerilla dibihîstin, xwe diavêtin erde, digiriyan û digotin: "Hün ne hevalin. Ezâ rapora we ji Serok re bişînim. Wê keleşekê ji min re bigine û yê we ji bixe girtîgehê." Hevalan ji, ji wan re digot: "Hün hevalê me-ne, lê belê barê me pîr giran e. Şev reşe û rê pir dûr e. Careke din ku em werin, emê we bi xwera bibin." Belê ev textikên ha, pir caran fêde nedikir û zarok qayfl nedikir. Ji ber ku ev textikana pir caran hatibûn bikaranın.

Dawiyê ji; zarokên Kurdan bi tu awayî nedihatın xapandin û bîryara rast digirtin. Dest avêtin çekên hevalan xweyên mezîn û berdedan. Çekên şehîdan li erde ne hîştin.

Iro ji, bi hezaran şervanen zarok, li çiyê de cihê xwe girtine. Di vê rê de şehît ketine .

zimanê Kurdi dibin.

A.Welat: Erşen kîye?

Brûsk: Cîranê me ye. Antena wan tune ye. Ew ji bi me re hînê fîrbûna zimanê Kurdi dibe. O heta dawiyê MED-TV temage dike.

A.Welat: Tu Serokê Kurda nasdikî?

Brûsk: Belê ez nasdikim. Ma kî nas nake? Birayê min Mazlûm 2 saliye, ew ji Serok nas dike. Dema ku Serok xeber dide, axaftin li mala me qedexe dibe.

A.Welat: Tu li mal kar dikî?

Brûsk: Belê, ji ber ku bavê min ji kar avêtin, hewce-yê malê hebû, ez û birayê xwe, em simitan difroşin.

A.Welat: Belê hevalê Brûsk, ji bo vê hevpeyvîna te, em pir sipas dîkin û dibêjin di nav xweşiyê de bîmîne. Li MED-TV temage bike.

Brûsk: Ez ji sipas dîkin. Ezê MED-TV temâse bikim.



**Têbinî:** Ev nivîs ji Girtîgeha Ümraniyeyê ji me re hatiye. Wekî tê zanîn Penaberên Kampa Etrûşê pişti ku ji wir hatin koçberkirin, di bin kontrola NY'ê de çûn Kampa Nînovayê. Ew penaber niha li Iraqê li Herêma Mahmûr ku wekî cih di bin kontrola PDK'ê de ye niştecih in. Jiyana penaberan di bin kontrola NY'ê de ye. Her wiha zordariyên li ser jiyana wan, wekî ji ser wan av qutkirin û hwd. dom dîkin. Penaber bi piranî zarok û jin, ji heft hezar mirov in.

# Du hejmarê Nûbiharê bi dosyayeke taybet derketin

## Rojnameya Kurdi ya Pêşîn: Kurdistan

Înstituya Kurdî ya Stenbolê xebatê xwe yên ji bo dewlemendkirina ferheng û toreya kurdî didomîne. Pişti çend pirtûkên li ser mijarê cur bi cur îcar jî ji bo Sedsaliya Rojnamegeriya Kurdi pirtûka Felat Dilges a bi navê "Rojnameya Kurdi ya Pêşîn Kurdistan" ji nav weşanê Înstituya Kurdi ya Stenbolê derket.

Pirtûk, bi pêşeka Înstituya Kurdi dest pê dike. Di vê pêşekê de li ser girîngiya çapemeniya kurdî tê rawestandin. Her wiha tê gotin ku rista çapemeniyê ya bûyertomarkirinê jî heye. Ji bo vê yekê jî ji Rojnameya Kurdistanê du mînak hatine dayîn; hejmara kurdênu ku ji bo xebatê çûne Edeneyê û ji ber xwendina rojnameyê kuştina xwendeyekî rojnameyê bi destê dagirkeran e.

Nivîskar Felat Dilges jî pêşgotinek nivîsiye. Dilges di pêşgotinê de li ser girîngiya rojnameya Kurdistanê rawestiyaye û hinek agahî li ser dîroka rojnameyê dane.

Pirtûka navborî ji 6 beşan pêk tê beşa yekemîn li ser dîroka rojnamegeriyê ye. Beşa duyemîn gîranî daye ser dana-sîna malbata Bedirxaniyan û danerê rojnameyê, beşa sîyemîn bi awayekî gişî li ser Rojnameya Kurdistan radiweste. Di beşa çaran de nivîskar îcar li ser rewşa siyasi û têkiliyên kurdan û Partiya Îttihât Terakî radiweste. Beşa 5'an li ser

hinek- taybetiyê rojnameyê û navero-ka wê ye. Di beşa 6'an a pirtûkê de pey-va dawî, bîbliyografya û rîzenav cih digirin.



### Kovara mehanne Nûbihar

Mehnameya çandî, hunerî, edebî Nûbihar bi hejmarê xwe yên 64–65' an derket pêşberî xwendeyan. Di vê hejmara kovarê de dosyayeke berfireh bi sernîvîsa "Ji destpêkê heta îro medreseyen kurdan" hatiye amadekirin. Di vê dosyayê de gelek kesan li ser medrese-

yen kurdan nivîs nivîsandine. Di van nivîsan de ji gelek aliyan ve medreseyen kurdî têne nirxandin.

Bo nimûne di nivîsa yekemîn de Berpirsê Karê Nivîsaran ê Nûbiharê Süleyman Çevik di bin sernavê "Medresê ji dîn û ziman re xizmet kiriye" gotarek nivîsiye. Di vê gotarê de her wekî ji ser-



nav ji diyar e, bi gîranî li ser alikariya perwerdehiya medreseyê di warê geşbûna zimanê kurdî de û xizmeta medreseyan a ji bo ola îslamî hatiye rawestandin. Çevik daye zanîn ku di medre-

seyan de perwerdehî bi zimanê kurdî bûye, her çiqas pirtûkên ku hatine xwendin bi zimanê erekî bin jî şiroveya wan bi zimanê kurdî çêbûye. Vê yekê jî di gesedana zimanê kurdî de xizmeteke mezin kiriye.


Di dawiya vê nivîsê de Süleyman Çevik dide zanîn ku medreseyan ji ber du biryaren neyinî yên komara tirk xesareke mezin dîtine, ev ji biryara yekîtiya perwerdehiye angô Tewhîdî. Tedrisatê û vekirina dibistanê İmam Xetîbêne. Bi biryara yekemîn perwerdehiya medreseyan hatiye qedexekirin, pişti vebûna dibistanê dewletê yên imam xetîbê mafê meletiyê ji destê kesen ku perwerdehiya medreseyê dîtine hatiye standin lewre jî tu rola medreseyan nemaye.

Ji bilî vê nivîsê, gelek kesen din jî li ser hinek aliyan medreseyan nivîs dârâtine. Bi vê dosyayê mirov dikare li ser medreseyen kurdî gelek tiştan hin bibe. Gelek aliye medreseyan; ji pêkenokan bigire heta pirtûkên ku li medreseyan hatine xwendin, cihê medreseyen navdar, rewşa wan a îro bandora medreseyan li ser torevaniya kurdî bi nivîsen kesen mîna Zeynelabidîn Zinar, Kerem Soylu, Feqî Huseyn, Memê Alan, Suleyman Şoreş, Ebdullah Tellî, Mele Ebdulkerîm Cizîrî, Giyaseddin Emre û hwd. ronî dibin.

SERWÎSA ÇANDÊ

## Diyarbakır in "D" si

OSMAN ÖZÇELİK



**G**iregirê artêşa tîrk giregirê rojnamevanê tîrkan bi balaflîn gîhîndin qada şer. Giregirê rojnamevanê herî gir, cilîn 'mehmetçîk' an, ên belek kişandin ser bejn û bedena xwe.

Generalan ferman da. "Şervanê me yên mîrxas, PKK qedandin. De herin di rojnameyê xwe de wisa binivîsin."

Rojnamevanan nivîsin. "Li herêmê PKK qediyave. Ne qediyabe jî marjînalîze bûye. Êdî dor hatiye ser seferberiya aborî, sosyalî û çandî." Rojnamegerên herî welatparêz bang û gazî li dewletê û li dewlemendê kurdan kirin ku, li herêmê karxaneyan (febrîqe) vezin. Belê, ne ji dewletê û ne jî dewlemendê kurdan tu deng derneket. Ma dewlemend bi her derewan bixapiyana, wê çawa bibûna dewlemend. Tenê feqîr bi derewan dixapiyan.

Seferberlikâ aborî bi rî neket, belê seferberlikâ sosyalî û çandî her berdewam e.

Nîha navê projeya dewletê ya jirêderxistin û bêhişkirina kurdan ÇATOM e. (Çok Amaçlı Tomlumsal Araştırma Merkezi) Ango, Navenda Lêkolînê Civakî ya Pirarmanc. ÇATOM'ê nîha konê xwe li Şîrnexê û li Sîrtê vegirtiye. Ci dike ÇATOM? ÇATOM li ser navê hînkirina neqîş û dirûnê, li ser navê fîrkirina çêkirina xalîçeyan ji bo keçen kurdan qursen bêpere li dar dixe. Qursen xwendin û nivîsnê, yên axaftina bi tîrkî û qursen perwerdehiye amade dike. Ji keçen kurdan re dibêjin her yek ji we jî, dikare bibe Hülya Avşar û Sibel Can. Keçen kurdan ên ji hedefa perwerdehiya heş sale filîtîne dikevin dafika qursen asîmîlasyonê. Êdî keçen kurdan li Şîrnexê bi mayoyen tenik (şeffaf) dikarin li ser podyûman di bin ronahiya spotan de û bi muzîka rojavayî de bimeşin, defîleyen cilîn nûjen amade bikin.

Li Wanê, li Erzinganê, li ser ava bendava GAP'ê xortê kurdan êdî wê bikarîbin sorf, skî bikin, wê bikarîbin bi rakêtan li goga tenîsê bixin.

Dewlet dixwaze dilê keç û xortê kurdan bibije jiyanek dewlemend û nûjen, ku xort dernekevin serê çiyan.

Hunermand ketine rîzê ku biçin li bajarê kurdan konseran bidin. Serokatiya hunermendê muzîkê, Sezen Aksu dike. Şef

Gürer Aykal bi orkestraya senfonî ya Üniversiteye Bilkentê li Şîrnexê konsereda. Dengê qırceqîrça dendikan û benîşten keçikan bi ser yê orkestrayê ket. Keçika hatibû konserê, ji nûcîgihanê tv'yeke re digot, "ji me re gotin konsera Mahsun Kîrmîzîgül heye, em ji bo wî hatin."

Seferberlikâ qesmeriyê berdewam e. Hunermendê qesmer M. Ali Erbil jî dixwaze ji vê seferberlikê û xizmetê bêpar nemîne. Divê wekheviya tîrkan û kurdan pêk bê. M. Ali di programa xwe ya "Çarkîfelek" de ya pêswaziya bi tîpa 'D' bîbêje, devê xwe mîna bêrekê pahn dike û dibeje "Diyarbakır 'D' si an Şîrnak 'in 'Ş'si. Hûn dibîn bê çiqas fedakariyê dîkin û çiqas wekhevîwaz in (!)

Hûn ê kê bixapînin? Me ewqas gundêne xwe ji bo qursen nexşandan şewitandin? Yan jî me ewqas mirovên xwe dan zindanan û işkencan, ji bo keçen me bikarîbin mayo li xwe bikin? Me ewqas xwîna xwe rêt ku M. Ali Erbilê qesmer lutf bike bêje Diyarbakır'ın 'D'si?

Li Almanya, lêkolîneke li ser mişkan, derxistîye holê ku mişkîn li muzîka Mozart guhda dîkin, ji yên din biaqlıtir dibin.

Em salixa muzîka Mozart didin rayedarêne tîrkan.

# Rojnamevanekî nû

**R**ojekê zilamekî ji serhedê nû dest bi rojnamevantiyê dike û girênendeyê rojnameyê jê re dibêje: "Heval li kolana İstiklalê daxuyaniya çapemenî heye, divê tu biçî bişopînî."

Zilamê ku navê wî Ferat e makîneya wênekişandinê digire û derdikeve. Gava digihêje cihê daxuyaniyê, gel kom bûye û radibe wêneyan dikşîne, li dûv xelasbûna livbaziyê vedigere navenda rojnameyê. Hevalen wî jê dipirsin dibêjin: "Hevalê Ferat te çi kir?" Dibêje: "Heval wele min sê wêne kîşandin lê yek şewitî." Hevalen wî ecê dimînin û dibêjin: "Ma me hê wêne dernexistine tu çawa dizanî ku yek şewitiye?" Ferat bersiv dide: "Heval gava min wêne dikişandin, min qapaxa objektifê venekiribû, loma ez zanîm şewitiye, ji ber ku tiştek xuya nedîkir."

## Tırkiya jinika bajarî

Jinek, mala xwe ji gund anîye bajêr. Li bajêr hemû kes bi tirkî diaxivin. Ên ku nizanîn jî nabêjin em nizanîn. He-



mû dixebeitin ku bi tirkî biaxivin. Jîni-ka ku mala xwe biriye bajêr, bi koteke çend peyv hîn bûne. Gazî cîrana xwe dike û dibêje: "Komşî, komşî! Şu bellek tavuqunuz var ya, gelip benîm kula-elim ûzerîne zirz ettî. Ben de aldim bir kevir, vurdum newqîsîne, îcar bi çargavî koştî."

## Xalê Evdila û Rojî

Di dema damezirandina komara tirk de, xalê Evdila tevî çend hevalen

xwe li Amedê, di çêkirina riya hesin de dişuxulî. Nîvro hevalen wî dibêjin: "Xalê Evdila, biçe firinê ji me re çend nanan bîne." Xalê Evdila diçe firinê, nan distîne û di nanekî serî re jêdike û dixwe. Firinkar jê dipirse:

– Xalo te xwe şas kiriye! Di vê rojiya remezanê de tu nan dixwî. Ma qey tu fileh i?

- Na.
- Tu mecûsî yî?
- Na.
- Tu cuhî (cihû) yî?

- Na.
- Vêca firinkar aciz dibe û dibêje:
- Xalo lê tu çi yî?
- Xalê Evdila dibêje: "Ez emele me."
- Berhevkar: Bavê Egî

## Dîk û rovî

Rovî, rojekê pir birçî bûye, dadike ve gundeki dinihêre ku gund vala ye tenê dikek li ser darê ye. Dibêje: bira-ye dîk ez pir birçî bûme ka dakeve tiştekî bide min, ez zikê xwe têr bikim.

Dîk dibêje: Birayê rovî işe min heye, hema ji kerema xwe re li serê kuçeyê bizivire, muxtar li wir e, wê tiştekî bide te.

Rovî li serê kuçe dizivire ku çi bibîne! Tajiyeke dûvdirej û êrîşî rovî dike. Rovî li ser çar lingan diheliqe û baz di-de, digihêje texmî dîk, ji dîk re dibêje: "Heta tu li vî gundî nahmuxtar bî û ta-jî jî muxtar be ev gund li min heram be, ez hew têm vî gundî."

Azad Şîrîn

## BI XELAT...

## XACEPIRSA BI XELAT (134)

## XACEPIRSA

Seydan Kest di wêne de	G	Peygah	T	Sîca Kest be av	I	Amîdar Tipak	E	Bâzı Bâzıpar k	Z	Kerabé
M	D	L	A	T	(B)	O	2	L	A	K
Kurta (Zeyîn) Demes beş	L	A	W	I	N	M	0	N	A	
2	A	A	A	I	S	A		A	V	
Zedan Beri silde	2	I	N	E	N	I		I		
B	E	R	B	A	N	G	N	E	L	
Gîzinek	R	Tipe pêşîn	A	Gîzinek herandî	E	Qerzîk	A			
	O	R	A	M	A					
Sembola kesî Kesî	A	Tipe pêşîn	L	I	N	D				
A	X	I	N	Tipe pêşîn T'ye	R	Dengdêra Qer	U			
<b>PEYVA VESARI</b> → BİLÜRRAVAN										

### Bersiva Xacepirsa 132'yan

Xacepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigîhîjin destê me, em dé wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 134'an Kaseta Koma dengê Azadi 'Kîlama Hêvî'ye

#### Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Vêşarı" di nava qutiyêni li bin xacepirse de binivîsin û tevî navîşana xwe ji me re bişînin.



Mebûsekî kurd (Wêne) Ard	Teyrek Bikirdî Giya	Tipa beri "H"yê	2	Navçeyeke Kurdistan a jérin Navek	Nişana serxwe- bûnê Qertafek	1
Rewş			Karker			
Dijberê bakur		Hacet				Beg
		Serhildan				
			Berepaşki notayek Rêxistina meksiça		Dijberê nér Kêfxweş	
Menzel	Geleki li behra reş			Jan kişandin		3
		Sala çûyi			Komeke Zimanan Kovareke bi kirdki	
Sembola oksijenê Pénasek Feodal	Pîlansaziy ekê Yekitiya Sovyetê			Tipa dawîn		
			Ket xewê			
Tipa pêşîn	Tîştên şemîtok			4	Dengdara 'Ta' yê	
Cephe			Mektüb			

PEYVA VESARI →

1 2 3 4

## VENGÜVAZEN SANSURKERDEY

Serokê Giştî yê PKK'î Abdullah Öcalan

## Seba şarê tirk jî demokrasî wazem

14 gelawêj 1998

Encamê şerî di mabenê 15 gelawêj 1984 û 9'ê gelawêj 1998 wina wo: ARGK hetanî nika vera dewleta tirk 18 hezar û 274 hebî vardayin, mayinkerdin, kemîn, pêrodayîn, sabotaj, suîkast û zey nînan viraşti. Şerê 1-15 berfanbarê 1995 û 1-15 gelawêjî 1996 û vardayinê ke PDK rê virazyayê miyanê nê reqeman de niyê.

Di nê 18 hezarî û 274 hebî livbaziyan de (pêrodayînan de) hetê gerîla ve qaso ke amey tespitkerdin kiştey dewlete 42 hezarî û 500 hebî yê. Di enian de 31 hezarî û 415 hebî subay, assubay, û eskerî, 5 hezarî û 365 hebî tîmîn taybet, polîs û ajanî, 5 hezarî û 717 hebî jî cehşî yê.

26 gelawêjî- 10 berfanbarî 1995 û 14'ê gulanî 1997 ra heta nika kiştey PDK'î tewrê nê reqeman niyê. Di nê wextî de vinîbiyayînê PDK'î 5 hezarî û 315 hebî yê.

Di şerê çarês (14) seran de vinîbiyayînê gerîla jî 6 hezarî û 679 hebî yê. Reyna yena texmînkerdin ke di şerê çarês seran miyand de mabenê 8 û 10 hezarî de jî şarê sivilî kişayayê.

16 gelawêj 1998


Serokê Giştî yê PKK Abdullah

Öcalan, rojo verin tewrê panelê MED-TV bi û 15'ê tebax ser wina vat: "Anatoli ameyinê tîrkan de, dewlet, imparatorî, cumhuriyet û netewebûna ïnan de rolê kurdan gird o û tekoşînê mayê ewroyino jî qandê şarê kurd nasname û qandê şarê tirk jî demokrasîya". Öcalanî vat ke, tîkoşîne tenê bi doza netewe ra girêdayin niyo, bi tekoşîn mirovatî ra jî girêdayî yo û coka jî ma hera ewnenê ci ra. Serokê PKK reyna ard vîri ke Mezopotamya gongolaya (besik) însaniyetiye û peyra jî wiina vat: "Tiya dîroka gird û nirxê insanî nimiteyê. Nê karî ra rind û pîroz kar çiniyo. Ewro mayê nê nirxan vejemi werte". Öcalanî qiseyê xo wina ramîti: "Îmtihanê dîroke yê herî zor amew dayîn. Di nê nuxtan de şarê kurdî tersê mergî werdo. Nê şerî de hendî peydeşiyayîn (tîkçûn) çiniyo. Hedreyî ma esto ma

eskenê bi seran nê şerî raver berin. No şer nê çarês serî, 140 serî dewam bikero jî kokêcê (binêcê), çebiyawo".

16 gelawêj 1998

".....Semedê tevgere heme ganê (gere) arşîv bîbo. Bi taybetî hevalê ke şehîd kewtê, vîranînê ïnan biyarê ca û ïnan dosya kirê. Çikew gir bi hereketî ra girê-dayew, bûyer û belgey gere bêrê



arşîvk-  
erdin. Arşîv  
gere bi  
nazîkî bêro  
hedrek-  
erdin.  
Seba bel-  
gey

navendî,  
seba arşîvî weşanî gere cuda bêro  
girotin û gere rasterast navend berpîrs  
bo." ana vatene Serokê Giştî PKK'î  
Abdullah Öcalanî û demo serey  
tekoşîne de nameyên ke riştî bî  
serleşkerê rîberan ra Weşanê  
Serxwebûnî zey pirtûko belgeyîn çap  
kerd.

Panc beşî û di 1979-1984 de namey  
gir nuşte di tekoşîney kurdan de demê  
herî zehmet nika kenê roşnî.

Serokê Giştî yê PKK di nameyen  
de vano gerek şer nîro hereyfinayîn,

kêmanî bifinê en tay û namey xo jî di  
binê nameyan de wina nusnayo:  
Şervan, Kanî, Ammar, Felat, Alî,  
Bawer û Botan.

Nê pirtûkî ra jî ayseno ke Serokê  
Giştî yê PKK, şerî reyayino ke hewna  
dewam keno de zehf herciyayî dano  
belge û arşîvan.

Di şerê kurdan a vejîne û merdinî  
de iyê ke jiyanê xo kerdê vinî di binê  
nameyan de nê namey bi kar ardêne:  
Kemal Pir (Ebu Ali), Mahsun  
Korkmaz (Cano), Mehmet Karasungur  
(Felat), M. Hayri Durmuş (Xoşnav).

WELAT

## Vexwendname

Em dê bi beşdarbûna we di vekiri-  
na nûnergeha Azadiya Welat a

Diyarbekirê de kîfxweş û serfiraz bibin.

Azadiya Welat doza mafîn gelê me bi zimanê gelê me  
dide pêş. Bi vebûna Şaxa Amedê dê doza azadiya welat  
geştir bibe.

**Cih:** Kıbrîs cad. Türk Hava Kurumu apt. Kat/5  
**Dağkapı/Diyarbakır**  
**Mejû:** 29.08.1998  
**Saet:** 14.00

WELAT

ROJNAMEYA HEFTESİ  
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmîyaz Sahibi)

M. NURI KARAKOYUN

■ Yönetim Yeri

İstiklal cad. Asmali Mescit sok. 35/37 No:308

Beyoğlu/İstanbul  
TEL: (0 212)  
251 79 37-251 90 13  
FAX: 251 95 85

■ Gerineneyê Giştî yê Weşanê  
(Genel Yayım Yönetmeni)  
SAMÎ TAN  
■ Berpîrsê Karêz Nivisarasa  
(Yazî İþleri Müdürrü)

M. SALİH TAŞKESEN  
■ ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.  
■ Yayın Koordinasyon:  
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.  
  
■ BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım  
■ NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliğimiz)

■ Diyarbakır  
Tel: 0 (412) 223 34 83  
■ Mîرسن  
Tel: 0 (324) 233 83 96  
■ İzmir  
Tel: 0 (232) 425 37 02  
Münchén:  
(Nûnerê Giştî yê Ewrûpayê)  
Mahmut Gergerli  
Tel: 49 871 672 29

Fax: 49 871 670 815  
■ Swîsre:  
Ihsan Kurt  
Tel-fax: 41 21 652 76 07  
■ Hollanda:  
S. A. Fewzi  
31 104 85 55 43  
■ Suriye:  
Jana Seyda  
Helim Yusiv

Serokê Komeleya GÖC-DER a Stenbolê Mahmut Özgür.

# Rûdanên dawîn ji ber tirsê ye

"Ev raman û kirin binpêkirina mafêن bicihbûn, ger û xebatê yên gel bi taybetî jî yên lêqewmînên koçberiyê ne. Heman kat binpêkirina maf û azadiyêن ku ji zagona bingehîn, peyman û rêzikên navneteweyî têne."

Mahmut Özgür



**D**i van rojêن dawîn de gelşa koçberiya kurdan dîsa kete rojeva raya gişti. Trajediya koçberiya kurdan hate asteke wisa ku çapemeniya tirk jî ji mecbûrî ev rewşa wan anî rojeva xwe. Li Çolemêrgê li ser sergoyê berhevkirina xwarinê, li Amedê dîmenêن ku dema di nav herî û gemarê de belavkirina nêن de derketin holê vê rastiyê bi zelalî dipeyitînin.

Roja 18'ê gelawêjê di rojnameya Milliyetê de nûçeyek bi sernavê Trena Şermê hate weşandin. Di nûçeyê de çiroka rêwingiya rojekê ya karkerên demsalî ên kurd ku ji Amadê diçin Arifiye Sakaryayê tê zimên. Trajedî bi kurtayî wiha ye: Her car di dema rêwingiya trenê de dramek derdikeve holê. Rêwingiya ku 1643 km didome ya malbatên karkerên demdemî yên findiqan diqulibe işkenceyê. Deslav di demjimêra pêşin de dixitim, mirov hewcîyi dilopek av in, bi şev ronahî tune. Di kompartmanêن ku ji bo 12 kesan in de 25 kes dimînin. Ji ber kesen ku di hewşan de radikevin tu nikarî gav biavêjî. Ji hawirdor bêhna nebaş difire. Tren berî ku bê rawestgehan bêhneke erjeng belav dike.

Wekî ku tê zanîn van rojêن dawîn waliyên Ordu û Giresunê ji bo karkerên kurd ên ku bi demsalî kar dikin ketina van bajaran qedexe kirin. Her wiha waliyê Orduyê Kemal Yazıcıoğlu karkerên kurd ji vî bajarı derxistin. Karker niha li derveyî bajêr di kon û çadiran de dijîn. Li ser vê, gelel der û doran bertek nişan dan û ev wekî kirineke njadperest nirxandin. Yek ji wan kesen ku bertek nişan dan jî Cigirê Sekreterê Gişti yê CHP'ê Eşref Erdem bû. Erdem di daxuyaniya xwe ya Milliyetê de bi kurtayî wiha got: Yazıcıoğlu bi pest û çewsandinêن jendermeyan û bi rêbazên faşizane van mirovan ji bajêr derdixe. Hîtiler jî ne wiha bû. Divê wâlî di heman keliyê de ji wezifeya xwe bê dûrxistin.


Dîsa roja 27'ê tîrmeha 1998'an waliyê Stenbolê Kutlu Aktaş daxuyaniyek da çapemeniyê. Aktaş diyar kir ku ji bo koçbe-

riya ku diherike Stenbolê bê astengkirin divê ji herkesi vîze bê xwestin. Kesen ku ne xwedî avahî û kar bin divê destûra wan a rûniştina li Stenbolê nîn be. Serokê Belediyeya Stenbolê R. Tayip Erdogan jî daxuyeniye da û piştevaniya vê yekê kir.

Li ser van rûdanen roja 18'ê gelawêjê Serokê Gişti yê GÖC-DER'ê Mahmud Özgür li navenda gişfi ya komeleyê daxuyaniyek da çapemeniyê. Özgür di destpêka axaftina xwe de got ku waliyên Ordu û Giresunê ketina van bajaran a karkerên kurd ên demsalî bi derxistina gişfinameyan qedexe kirine. Özgür ev rûdan wekî rûdenêke tırsnak nişan da û wiha got: "Ev raman û kirin binpêkirina mafêن bicihbûn, ger û xebatê yên gel bi taybetî jî yên lêqewmînên koçberiyê ne. Heman kat binpêkirina maf û azadiyêن ku ji zagona bingehîn, peyman û rêzikên navneteweyî têne." Her wiha Özgür bal kişand ser vê yekê ku ligel ku evqas dem bihuriye jî rayedarê dewletê tu daxuyanî nedane. Wî got ev jî nişan dide ku dewlet vê yekê tesdiq dike. Serokê komeleyê axaftina wiha berdewam kir: "Li Stenbolê û bajarinê din

daxwaza tetbiqkirina vîzeyê helwesteke cudaxwaz e. Feraseta kirinê ku Şirnex, Ordu û Stenbolê wekî hev nabîne Tirkî ber bi qêranê ve biriye. Ji hêla aborî û civakî ve bûye egera cudahiyên kûr û mezin ên di nav herêman de, her wiha li dijî pêşveçûna çand û zimanê cuda bûye asteng."

Mahmut Özgür wiha berdewam kir: Bi salan e bajarênen kurdan bi rewşen ne asayı (OHAL), bi pest û çewsandanin têne birêvebirin. Li herêma OHAL'ê bi hinceta "Ewlekariyê" bi hezaran gund hatin valakirin. Di encama kontrolkirinê xwarinê, qedexekirina zozanan, girtin û binçavkiran de bi milyonan mirovan mal û gündên xwe terk kirin û bûne koçber. Rayedarên dewletê divê mafê jiyana taybet, milk, kar, bicihbûn û gerê yên van mirovan biparasta. Lî berevajî vê, dewletê ev mafê lêqewmînên koçberiyê binpê kirine. Bi milyonan koçberan jan û astengiyê xwe, digel xwe birine van bajaran. Her wiha li van deran pirsgirêkên wan çareser nebûne berevajî vê zedetir bûne. Koçber li guhêvan bajaran di holik û kolîten bê av û



Waliyê Orduyê Kemal Yazıcıoğlu û qedexekirina ketina karkeran a Orduyê li ser xwe qebûl nake. Lî belgeku ku Gündemê roja 19'ê gelawêjê weşan bê yekê her tiştî diyar dike.

elektrîk de dimînin û her wiha ji xizmetî perwerde û tendurustiyê bêpar mane. Lî qewmînên koçberiyê ji agahî û çanda ji yana bajaran agahdar nîn in û bêxanî, bêkar û birçi ne. Niha jî bi milyonan mirov ligel van êş û keserên xwe ji ber ku kar avahiyêwan tunene bi gelşa vîzeyê re bi rû ne. Özgür li ser hin pirsan got ku tenê di navbera heft salan de pênc milyon kes koçberî Stenbolê bûne û ji van li dom milyonekê ji ber egerên şer koç bûne. Wekî dawî wiha got: "Pirsgirêka koçber ya ku ji ber egerên şer derketiye holê di demeke kurt de bê çarserkirin.

## Pêşniyazên GÖC-DER'ê yên ji bo çareseriye

1- Divê waliyên Ordu û Giresunê û ji qedexeya li ser karkeren kurd berdin. Lî ji wezifeyen xwe bêne dûrxistin.

2- Em ji serokwezîr derbarê pêşniyaz bikaranîna vîzeyê de û bo daxwazên qedexeya bicihbûna kesen ku bêkar û bêmal in daxuyaniyekê dixwazin.

3- Divê zerarên kesen koçber bêne çesipandin û pêdiviyêwan bêne bicihanî.

4- Ji bo vegera gundan divê OHAL saziyên bi cerdevaniyê re têkildar in her wiha rêzik û gişfinameyên derbarê wê de ji holê rabin.

5- Divê dawî li qedexeya zozanan i kontrola xwarinê bê.

6- Divê pirsgirêkên lêqewmînên lehî erdhejê berî ku zivistan dest pê bike çareser bibe.

7- Pêwîst e ku gelşa kurd bi rengel aşıtiyane û demokratik bê çareserkirin. Zâgoneke bingehîn a hemdem û demokratik bê amadekirin. Ji bo ji navê rakirina cudasîhiya di navbera herêman de divê pêşniyeyen rasteqînî têkevin jiyanê, ji bo pêşveçûna ziman û çandêni cihê asteng ji hêl rabin.

MEMED SERHEDÎ / STENBO



Stenbolê tenê di navbera heft salan de pênc milyon kes koçberî vir bûne û ji van li dora milyonekê ji ber egerên şer koç bûne.